Ew pir girtîgehê da namîne. Çînovnîkên dewletê, dema karê wî lêkolîn dîkin, pê dihesin, ku Erebe Kurdekî Êzdî ye. Bi fikira wan Kurd giva ewqas jî siyasiyê fem nakin û nikarin bîvîne komûnîst, bolşevîk. Erebe berdidin.

Ji pey girtîgehê ra demeke kin li gundê xwe, Sûsîzê dimîne, paşê dizî va derbazî Rûsiyayê dibe, diçe bajarê **Stavropolê**. Wê demê li Rûsiyayê şorişa Oktîyabirê pêk hatibû. Hukum ketibû destê Bolşevîkan. Erebe dikeve nava Ordîya Sor ya nû avakirî, kîjanê ra digoton Givardîya Sor. Sala 1918an ew êdî endamê Partiya Komûnîstê Rûsiyayê (Bolşevîka) bû.

Xortê şoreşgerî serwest texmîn dike, ku bêt xwendina bingeîn nikare kêrî gel û partiyayê bê, xwestin, bîr û baweriyên xwe bîne sêrî. Sala 1920î diçe bajarê Moskovayê û zanîngeha Lazariyan da dor çar sala, heta sala 1924an dixwîne.

Sala 1924an vedigere Ermenîstanê. Wê demê Ermenîstanê da jî êdî qeydê Sovêtê ser ketibû. Ew Komîtêya Navendî ya Partiya Komûnîstê (Bolşevîka) Ermenîstanê da dikeve xebatê.

Hukumata Ermenîstanê ya nû, hema di salên xwe yê ewlin da mecalên anegor saz kir ji bo pêşvaçûyîna wê para gelê Kurd, yê li Ermenîstanê dijîtin. Ku wan ji halê

şûndamayîna kûltûriyê û aboriyê derxe ji her aliya va alîkariya wan kir. Gel halê koçeriyê û nîvkoçeriyê da bû. Mirovên Kurde xwendî pirr kêr bûn. Erf-edetên kevn e ziyandar qewlê nû ra nedimeşyan, li ser riya pêşketinê dibûn asteng û ziyana mezin didan civakê.

Di wî warî da ewledên gelê Ermenî pirr alîkarî dan dostên xwe yê Kurd, ji wan gelek zimanê Kurdî zanibûn û bi hizkirin diçûne gundên Kurdan, ku nav wan da nexwendîtiyê bidine hildan, Kurda ra kadroyên mîletiyê h a z î r d i k i r i n . Dibistanên g u n d ê n Kurdan yê nû vekirî da çawa dersdar dixebitîn.

Erebê Şemo kete nava kûrma wê xebatê. Ewî di nav gelê xwe da karê rewşenbiriye, kûltûriyê, perwerdeyê, ronakbiriye dîkir, pîrsgirêkên wan digîhand hukumatê, dijî edetên bêkêr û peymayên hukumdariya berêye fêodal şerr dîkir. Derheqa jiyana Kurda da di rojneme û kovarê komarê da dinivîsî.

Sala 1924an, 5ê heyva hezîranê li zozanê Elegezê civîna Kurdên nepartîvan hate derbazkirin. Civînê da axaftina hîmlî ya înrûktorê Komîtêya Navendî yê Partiya Komûnîstê Ermenistanê Erebe Şemo bû. Navê têma axaftina wî „V. Î. Lînîn û netewên biçûk,, bû.

Sala 1927an karê hazîrkirina ELFEBÊ bi serketin hate dewîanîn. Xudanê wê bûn mamosta Îsahak Maragûlov* û Erebe Şemo.

(*Îsahak Mêrangûlov ji gundê Vêrîn Divînê bû, komara Ermenistanê. Bi eslê xwe mexîn- Aşûrî- bû.)

Xwendina bi zimanê Rûsî, helaqetiyên wî tevî rewşenbîrên eyan û rêvabîrên hukumatê, mecal didan, ku ew pîrsgirêkên gelê xwe bigîhîne ciyên bilind. Bi însiyatîva wî sala 1928an komek xortên Kurd ji Gurcistanê û Ermenistanê şandine Lênîngiradê xwendinê. Ji pey kutakirina xwendinê ra bawerkî teva jî karne berbiçev kirin ji bo gelê xwe. Ji wan Qanatê Kurdo paşwextiyê bû zaniyarekî Kurd z a n i y ê yê bi nav û deng, Semend Siyabendov şerê dijî Almanîya Hîtlêriyê da bi mêranî şer kir û navê Mêrxasê Welatê Sovêtê stend.

Erebê Şemo xebata berbiçev kir ji bo sazûna rojnema Kurdiye “RIYA TEZE”. Sala 1930î li bajarê Yêrêvanê dest bi weşena rojname bû. Ew rêvabîrêkî berpîrsariya rojnameyî herî aktîv bû. Wê salê dîsa li Yêrêvanê xwendinxana dersdarhazîrkirinê ya Kurdî vebû. Berpîrsiyarê xwendinxanê yê ewlin ew bû.

Lê dirêj wê wezîfê nake. Zûtîrekê wî dişînine bajarê Lênîngiradê xwendinê. Ew



aspîrantûra Înstîtûta Dîroka Kûltûrayê da qebûl dibe. Wî çaxî ew usa jî di Înstîtûta Felsefe, Edebiyet û Dîrokê da dersê zimanê Kurdî dide.

Dawiya salê siyî li welatê Sovêtê da dest bi dijiwariyên (rêprêsiya) dîktatoriya stalînîzmê dibin. Bi mîliyonan evdên wî welatî yên bê sûc, am-tam dibin qurbanên wan dijiwariyan.

Kurdên Sovêtê jî ziyana mezin dîtîn. Sala 1937a Erebe Şemo li Pêtrogiradê (Lênîngirade) girtin û nefiyî (sîrgûnî) Sîbîrê kirin.

Dema jiyana xwe ya here aktîv û gulvedanê, dema efrandariya gurr da ew kete devê sur, serma û dijiwariyên sîrgûniya zulm. Di bin giraniya siyasiya neheq, ew jî warekî xwezevî mîna Sîbîrê da, ku qewlê hewayê û jiyane wusan in, ku degme evd, ew jî evdên welatên germ, karin lê îdare bikin, jiyana pirr çetin bû. Mecalên jiyane, yên here sade jî dewletê evdên nefîkirî ra hazir nekiribû. Yanê usa, kê çû, kê ma. Êdî derheqa nivîsar û efrandariyê da gîlî nikaribû hebûya, dima ber xwe bide ji sermê, birçîbûn û zordariyên siyasî xwe xweyî bikira, jiyana xwe biparasta.

Sîbîr bi mîliyona evdên wek Erebe ra bû goristan. . .

Ereb zarotî û xortaniya xwe da pirr dijiwariyên wusa dîtîbû, qal bûbû.

Ji pey bîst salên zemete dûr û dirêj ra, (ji pey mirina Sitalîn) sala 1956an, wî wa gotî “efû” dikin, dibêjin, ku tu sûcê wî tune, neheqî lê hatiye kirin.

Ji wur vedigere Ermenistanê, Yêrêvanê. Dîsa dest bi jiyana wî ya siyasî, civakî û efrandariyê dibe. Çi, ku salê sîrgûniyê wunda kiribû, şev-roj dixebitî ku wê valayê tije bike.

Mala wî nava bajarê Yêrêvanê, ciyê herî rind, li kûça ser navê ronakbirê Ermeniya

Xaçatûr Abovyan bû. Heta niha jî li ser dîwarê wî tamî, ji bo hurmet û bîranîna nivîskarê mezin kevîrekî mermerî guloverî bedew lê xistine û li ser bi zimanê Rûsî nivîsare: “Vê malê da ji sala 1963a heta 1978 an nivîskarê Kurd û xebatçiyê civakî Erebe Şemo, Şamîlov jîtiye.”

Di salên qeydê Sovêtê yên ewlin da, li Ermenistanê, ji bo Kurdên wê deverê jî mecalên pêşdaçûyîne hatin sazîkirin. Civaka Kurda şûndamayî û nexwendî bû. Halê fêodaliyê da jiyana koçeriyê û nîvkoçeriyê derbas dikirin. Dewletê her tişt dikir, ku netewên wek Kurda ji halê şûndamayîne derxe. Wan ra hîmê çandê netewî dihate danîn. Kadroyên xwendî, zane bawerkî tune bûn. Wezîfên pirr cawdar û giran diketin ser milê yên wek Erebe Şemo.

Wan sala jî dest bi emrê wî, yê efrandariyê dibe.

Sala 1929an ew tev Îsahak Maragûlov elfeba “Xwe xwe hînkirina zimanê Kurdî” diweşîne. Ev kitêba ya Kurdaye ewlin e, ku bi herfên latînî çap bûye. Ev elfeba dîrokî bû hîm, ku wê demê, welatê Sovêtê da nivîsara Kurdî ji tîpên Ermenî bîr guhestin bi herfê latînî.

Sala 1930î pirtûkên wî yên bi navên “Emirê Lênîn”, “Terîxa Rêvîlûsiya Oktiabirê”, “Kolxoz û kara wê gundiya ra” tên weşandin.

Wê demê ew rojnemên Rûsî û Ermenî da bi gotarên berfire pêşda tê, siyasiya dewleta nû xweyî dike, xelkê nexwendî, şûndamayî dide bawerkirin, servextîkirin ku dewleta nû ya xebatçî û belengazan, pale û gundiyan e, dixwaze çavê gel veke, ku ew zulmkar û kedxwarên xwe, yên rastî, nas bikin, meniya hejarî û feqîriya xwe bihesin û bisekinin aliye welatê Sovêtê, deshîlatdariya nû. Dijî erf-edetên kevne,

sewa pêşdaçûyîna gel ziyankar şer dike, efrandinên bedewetiyê dinivîse.

Di sala 1936an nivîsara wî ya bi navê „Li ser pêwendiyên fêodalî di nav Kurdan da” tê weşandin. Seva têatroyên gundên Kurdan şanoya nivîskarê Ermenî Alêksandir Araratiyan ya bi navê “ Koçekê derewîn “ werdigerîne bi zimanê Kurdî û diweşîne. (1930)

Sala 1935 an romana wî „ŞIVANÊ KURD“, lê salekê pey ra jî KURDÊ ELEGEZÊ tîn weşandin.

Bi weşandina

van efrandin, îlahî ya “Şivanê Kurd “ Erebe Şemo wak nivîskarekî Kurdî bi şuret hat naskirin, navdengê wî çawa li nava welatê Sovêtê wûsan jî li nava rewşembirên Kurde yên wê demê da bela dibe.

Ev romana biçûk bi gelek zimanan: Rûsî, Ermenî, Gurckî, Azeyrbêcanî, Firansî, Almanî, Tirkî, Erebi û gelek zimanên din hatiye wergerandin û weşandin.

Ciyê gotinê ye, ku salên siyî dema rewşembirên Kurd li bajarê Bêyrûtê berevoka pêşkêşî efrandinên nivîskarên Kurdên Sovêtê diweşînin herd efrandinên nivîskar, yê jorgotî jî ciyê xwe wur da digrin. Berevok jî bi navê romana „ŞIVANÊ KURD“ tê navkirin.

Nivîskar êdî rind haj edebiyeta Rûsa û Ermeniya hebû. Jiyana, deb, rabûn-rûniştandin, ziman, pirsgerêk û xeysetê çawa gelê xwe wusan jî yê gelên wê heremê zanibû. Hemî jî nav gelê xwe derketibû. Di nav bîr û baweriyên şoreşgeriyê da pijiya bû. Ev hemû bûbûn hîm ku nivîskar efrandinên berfire binivîse û jiyana gelê xwe (usa jî gelên cînar) bi zaravê Kurmanciyî xweş, bi réalîstî raxe li ber çavên xwendevanan.

Ew bi gelek rewşenbîr û nivîskarên gewre yên dema xwe, yên welatê Sovêtê ra nas bûye û dostanî kiriye. Îlahî hukmê edebiyeta Rûsî li ser wî pir tê xanê.

Nivîskar derheqa rasthatina xwe tev nivîskarê Rûsî mezin Maksîm Gorkî timê bi kêfxweşî gilî dikir. Gorkî hatiye Ermenistanê. Li bajarê Yêrêvanê, Erebe Şemo destnivîsara romana “ Ş i v a n ê Kurd “ dîst da rastî G o r k î tê. Gorkî

destnivîsarê hildide, bi dilxweşî lê dinhêre û dibêje: “Gelê Kurd bi zimanê nivîskarê xwe, Erebe Şamîlov qise dike...”

Romanoka “Şivanê Kurd“ çîroka jiyana nivîskar e, çîroka zarotî û xortaniya wî ye. Li nav nerastî û dijiwariyê emir da, li nav kar û bar, neheqî û zordestiyan milkedar, axa û began da zaroka Kurd ya malbata belengaz, mezin dibe, qal dibe, digîhîje femdariya sosiyalîstiyê, dikeve nava refên



şoreşvanan, şer dike ji bo azadiya evdên bindeste zêrandî. Romanê da bi nîgarkirina dîdem, bûyer û xeysetên şexsiyetan, nivîskar bi şerezatî û hûrgilî jiyana xulam û karkirên li cem kedxweran tîne li ber çavan. Ew ne ku tenê derheqa jiyana Kurda, lê usan jî derheqa gelên wê herêmê yê din da gilî dike. Dide kîvşê ku zordarî evdê her netewî jî dibe. Zalimê her gela weke hev in, hejar jî weke hev in.

Dîdemekî pirr balkêş e, dema gur dikeve nav keriyê pêz, şerê şivanê zarok, seyê wî Çevreş û gur. Bi zemetî ew gur ji pêz dûr dixin, nahêlin ew ziyana mezin bide kêrî. Lê gur bizina keşê melean dikuje. Ew goştê bizinê dibe dide xweyî. Dewsa keşe êginayî û culetîya şivanê biçûk qîmetke, “Xezebeke dijar ew girt, -nivîskar dinivîse, -ez birim axorê u li wê, ewqas li min xist, ku min ne dikarî xwe ji erdê rakim. Ez bê hiş li wê mam. Bavê min hat û ez li wê dîtîm û bi zehmet ez kişandim mal. Adat wa ye, ku şivan ji xisara ra ji aliyê guran nayêne berpirsiyar kirin. Herwekî şivan bê çek in, ev tişteki maqûl e. Lê kûlak Sêliverston, mezinê Molokanan guh ne da adat û qanûnan. Ji bo bizina birandî, ji saliya min çend rûblî û çend kopêk ji min birî.”

Eva rastiya jiyana wê demê bû. Romanê da, cîkî din hatiye nîşan dan çawa ji kêrî 3 pez unda dibin. Bi şaşî davêjin ser merivekî. Mûsa Beg bi zorê 3 peza ji wî distîne. Dema pezê undabûyi dibînin, beg pezê mêrik xwe ra hildide, paşda nadê.

Bûyerên wa romanê da pirr in.

Hewaskar in parên romanokê yên derheqa “dizîna” çetela, xwendina wî dibistana Rûsî ya dusale da, berodan û beranberdan da, derketina zozana, xezaya wê deverê ya delal da û hvd.

Nivîskar derheqa bûyerên wan sala yê wê heremê da qewimî gilî dike, şerkariya pale-

gundiyan û tevgera agirê şoreşgerî ku li nav leşkerên Rûs da gur bûbû nîşan dide.

Gelekî bi balkêşî tîn xwendin ew perên romanê, yên dema qeremanê wî bi zemetî derbazî Rûsiyayê dibe, dikeve li nav kûrma şerkariya şorişvaniyê û şerê bajarvaniyê. Vira usa jî ew derheqa rasthatina xwe tev hîmdarekî dewleta Sovêtê yê civakî î ewlin, serokekî şerê bajarvaniyê, yê evseneyî S. M. Kîrov da dinivîse. (Erebê Şemo usan jî rastî hîmdarê dewleta Sovêtê Vladîmîr Îlyîç LÊNÎN hatiye û tev axiviye).

Ji pey altindariya şorişê ra qehremanê romanê vedigere Ermenistanê, vira jî li nav Kurdan da dest bi xebata siyasî, civakî-çandî dike.

Di romanokê da nivîskar gelekî delal jiyana Kurda ya koçeriyê, deba wan, erf-edetên wan dide kîvşê. Gelek cî daye pismamtî û hogirtiya pale û gundiyan bindestê gelên cînar.

Romanoka wî ya wan salaye din, “Kurdên Elegezê” peyhatiya romana jorgotî ye. Ew jî çîroka jiyana wî ye ji pey demezirandina qeydê Sovêtê ra. Qehremanê romanokê Ereb bi xwe ya vira da bi navê Misto derdikeve li ber xwendevana. Vê derê êdî Misto xebata perwerdeyî, kûltûrî, çandî li nav gundiyan feqîrûbelengaz da dimeşîne, derdikeve dijî wa gotî “dijminên sinifê” Kurdên zengîn, kûlak, axa, beg û desthiletarên berê, edetên kevne ziyandar rexne dike, xebata perwerdeyî, çandî, civakî dike.

Herdu efrandin jî bi kurmanciya delal, xweş û dewlemend hatine nivîsar. Zarav yê serhedê ye, bi cûrê şirovekirina gelêrî hatiye pêkanîn, usan çawa çîrokbêjên Kurd çirokan dibêjin.

Gerekê usa jî bê gotin, ku peyvên biyanî, hevokên axaftina herêmî di nav nivîsara da pirr in. Kîjan, bi texmîna min ewqas ne kêmasiyê nivîskar in, çiqas dereca

nivîsandina zimanê Kurdî ya wê demê va girêdayî ne. Wura nivîsara Kurdî nû gavên ewlin davît. Tercûbe tune bun. Ew para Kurda bingeha xwe, welatê xwe qetyayî bû. Dîsa gerekê bi erênî bê nîrxandin, ku nivîskar ziman û zargotina gelêrî rind zanibûye, ku karibûye aliyê zimên da serkeve.

Qehremanên van efrandinan, navên mirovan, bûyer, cî û wer bawarkî hîmlî yê dîrokî û rastî ne. Nivîskar nakokiyên navbera bi alîkî axa, bega, dewletiya, aliyê din gundiyan kesîb da kiriye hîm û li wê çarçovê da nivîsarên xwe ava kiriye. Li cem wî axa, beg, serekeşîr, dîndarên êlan tev zulmkar, talançî, neheq, merivkuj û bê vîjdan in, gundî, pale, şivan, gavan, kesîb û belengaz jî evdin e pozîtîv in. Helbet li nav axa-bega da merivê neheq e xirab hebûne, lê derheqa teva da xirab nivîsar qelsîke van nivîsara ne. Ewî rind zanibû ku di nav navên ŞIVANÊ KURD da bi xiravî, nêgatîv daye xanê navne usan hene ku êlên xwe ji qirê xilaz kirine, anîne gîhandine Ermenistanê. Wan jî mîna her kesî, her Kurdekî êla xwe zemetî, belengazî kişandine. Heta niha jî navê hineka li nav Êzîdiyan Ermenistanê da bûne efsene, kilam avîtine ser wan. Bi keder gerekê bê nivîsar ku wan salên Sovêtê, yên ewlin da komûnîstan û komsomolan, ciyê vala, bê sebeb gelek neheqî wan evdên bi rûmet kirin.

Dema meriv bûyerên dîrokî û halê wê heremê yê siyasî, civakî tîne li ber çavan, dibîne nivîskar yekalî nêzikî qewmandina bûye, gelek tiştên girîng “bîra” kiriye. Şerê navbera Dewleta Rûs û Osmaniyê da (çiqaş jî giran be) tenê şerê navbera du împêratoriya, yê dagerkiriye nîne. Ew bûyera mirin-jiyanê ye çawa seva bineliyê wê heremê yê Xirîstyan, usan jî seva Kurdan, xasima Kurdên Êzdî. Aliyê hukumata Rûsiyayê ya nû, Sovêtê da betalkirina şêr, çûyîna leşkerê Rûsa ji heremê, gelê wê deverê davê devê

zulma Osmaniyê û alayên hemîdiyê. Dewa peymana Sêvêrê, ku Rûsiya gotî xwedî wê heremê derketa, bêxayî dihêle... Rûyê Şoreşa Oktiyabirê da komûnîsta, hukumata Lênîn dewa Kurda pêşkêşî Tirkiyayê kir. Helbet, dem û bûyerên wî wedeyî cuda bûn û ji qewata nivîskarê me der bû bigîhîştî kûraya wan pirsan.

Ji rûyê nefiyayê da navbereke mezin dikeve nava jiyana wî ye efrandariyê. Wê sirgûniya Erebê Şemo rastî jî li nav pêşdaçûyîna edebiyeta Kurdê Sovêtê da valayîk çê kir, xazima di warê nivîsara vekirî da. Ji romana “Şivanê Kurd” tê zanîn, ku wê demê li meydana edebiyeta Kurdî da nivîskarekî xweyê qelema adan û bi şuret sekinî bûye.

Ew bi edebiyat û zimanê Rûsa hatibû perwerdekirin, zargotin û zimanê dê rind zanibû, ziman, deb, erf-edet, pîrsgirêkên gelên cînar ra ji nas bû, ji nav evdên here bindest derketibû, telî-tengasiyê jiyanê, nakokiyên navbera sinifan da, zulma hukumdarên, rev û beza gelên wê navçê bi çavên xwe dîtibû, tevî şerê Rûs-Tirkan û şerkariya Şoreşa Oktiyabirê bûbû, ciyê xwe di nav jiyana hukumdariya nû da girtibû, bi gilîkî hazir bû seva nivîsara karên edebiyetê yê mezinê, bingeîn. Eger ew ji nav civaka wî nehata dûrxisitîn û mecalên efrandinê bêpar nema, wê berhemên pîr giranbiha gelê xwe ra bihîştâ...

Bawerkî du dehsal şûnda ew ji wan dijiwariyên nefiya zulm xilaz dibe û dîsa vedigere jiyana efrandariyê. 22-23 sal ji pey “Şivanê Kurd” ra, sala 1958-an li Yêrêvanê romana xwe ya “Berbang”, lê salek şûnda “Jiyana Bextewar” tên weşandin.

Di nav romanên Erebê Şemo da ya here berfire û balkêş romana “JIYANA BEXTEWAR” e. Naveroka romanê nivîskar ji jiyana êleke Kurdan ya Sîpka hildaye. Bûyerên dîrokî, yên devedeve sed

salan xwe ra kiriye hîm û li ser wê fonê wan guhestinên bingehîn nîşan dide yên jiyana Kurdên wê heremê da qewimî bûn. Qehremanê romanê yê herî sereke Emerîke û bûyerên sereke li dora qedera malbata wî û Kurdên wê heremê pêk tînin, xazima êla Sîpkan. Nivê sedsala nozdan nakokiyên olî, civakî dikevin navbera evdên vê êlê. Zulm û zora dewleta

Osmanyê
jî zêde
d i b e .
M a l b a t a
Emerîkê û
Şîpkîyên Êzdî
tev, mecbûr,
cî û warên
kal bavên xwe,
milk û malê xwe
dihêlin, direvin
qeza Qersê, kîjan
wê demê bin bandora
dewleta Rûs da bû.
Koçber ya berbi warekî
nû xwe ra diwariyên nû
tinin. Rast e hukumdariya
Rûsa ewqas neheq,
bêwîjdan û zulm nîbûn çiqas
ya osmanîyan, li cem wan
hinek qewl-qanûnên civakî
hebûn, ku evdên sade jî zulma neheqa
xweyî dikin, lê vira jî rastî tune bû, vira
jî evdên kesîb, belengaz, xebatçî dihatin
pelçiqandin. Vira jî hukumdarî aliyê axa,
beg û zengînan bûn. Vira jî nakokiyên li
nav û hundur civakan diji evdên feqîr û
xebatçî dihatin kêranîn.

Dest bi şerê cihanê yê yekemîn dibe. Diniya dîsa li hev dikeve. Ew herem dibe meydana bûyerên neqenc. Jiyana xelkê ser û binî hev dibe. Li nav Rûsa û Tirka da dest bi şer dibe. Dengê Şorişê ji Rûsyayê tê digîhîje wura. Dîsa xelq cîşihitî dibin. Wê heremê

da hukumdarî ji qewatekê derbazî qewateke din dibe. Tek ji pey demezirandina qeydê Sovête ra rastî û aramê tînin heremê.

Nivîskar bi zarekî kurmanciyî xweş û hostatî weneyên jiyana Kurdên wê heremê yê wê demê raxistiye li ber çavê xwendevanan.

Ji pey çûyîna leşkerên Rûs ra ji heremê bêqanûnî, talançîtî, cerdevanî, rev-bez xelkê dikin devê qetil û zulmê. Emerîk û Kurdên Êzdî yê qeza Qersê mecbûr vê carê jî çemê Erpeçayê derbaz dibin, koçberî li nav Kurdên pala çiyayê Elegezê dibin. Lê ev koçberî ji koçberiya derbazbûyî zulmtir e, ewa reve ji xezebayê roma reş, ji kokbirkirinê, ji

kuştinê. Dema revê koka evdan tê. Dê ewledê xwe davêje. Xelayî, nexweşî, tirs, xof mîna şûre dudev evda dibirin. Dutîretî, nakokî û bêtifaqî li nav êl û eşîrên Kurdan da betir xurt dibin. Yên mîna Teyo Beg, dewleta Tirk ra dibin alîkar û ziyana mezin didin xelkên wê deverê. Dewleta Ermeniya ya nû avabûyî bêtaqet e xelkê ji hicûmkirinên Tirkan biparêze. Leşkerên Tirkan, tevî hemîdiyan bi xûn û zulm tînin digîhîjne gundên Kurdan, yên navça Axbaranê, pala çiyayê Elegezê. Koka xelkên van gunda tê. Gelek zilaman hêşîr digrin û berê wan didine kûraya Tirkîyê. Emerîkê jî tev wan hêşîra dibin. Ew rêva, bi cûrekî direve. Ji pey gelek diwariyan û



zemetiyan ra tê digîhîje mala xwe. Vira jî qewlê jiyane tunene. Mecbûr jina xwe gund da dihê, destê Sehîdê xwe digire û diçe bajarê Tilbîsê, xebatê.

Xelq bi hisret demên hukumdar ya Rûsa û leşkerên Rûse rem, yê ji weletê wan çûne ji bîr tînin.

Demezirandina qeydê Sovêtê edlayê û aramiyê tînine Komarên Kavkazê: Ermenistanê, Gurcistanê, Azerbaycanê. Kurdên wur ra jî rojên xweş tînin. Çawa teva ra usa jî lawê Emerîkê Sehîd ra jî mecalên xwendinê, pêşdaçûyîna vedibin. Ew berê mekteba bajarê Tilbîsê da dixwîne, kîjan seva zarokên Kurd vebûbû, paşê dişînine Lênîngiradê xwendina bilind. Ji pey xwendinê ra Sehîd vedîgere gundê Sengerê cem malbata xwe. Kolxoz gund da dixebite, mekebê da dersdariyê dike, derecên serketin û pêşdaçûyîna ra bilind dibe, digîhîje dereca şuxulvaniya serokatiya nehiyê. Tê binarti wek Şêkrêtarê ewlin yê Partiya Komûnîstê nehiya Axbaranê.

Dîsa Sehîd dişînine xwendinê. Vê carê diçe paytextê welêt, Moskovayê. Hema wê demê jî herba Cihanê ya duyemîn dest pê dibe. Almaniya Hîtlêrê davêje li ser welatê Sovêtê. Sehîd dide sîlihê û diçe pêşeniya şêr. Bi mîrxasî şer dike, dibe serleşkereki şereza, digîhîje ritma leşkeriyê ya bilind û ji bo mîraniya wî navê MÊRXWESÊ YEKÎTÎYA SOVÊTÊ didinê. Ji serokatiya leşkeriyê ya here bilind Emerîkê bav û Rihana dê ra seva mîrxasiya lawên wan nema razîbûn û pîrozbahiyê tê. Bi wê nemê jî roman dewî dibe.

Helbet ev bûyerên ku romanê da hatine dayîn ji aliyê nivîskar da çêkirî yanê berhemên fikirandina wî nînin, ew tev ji emrê Kurdê Sovêtê hatine hildan. Ew bûyer pêk hatine. Qehremanê wusa hebûne. Nivîskar bi xwe jî (Misto) ne tenê şahid e, lê şerkarekî aktîv yê wan bûyeran bûye.

Bûyerên romanê ji Entaba Sîpka dest pê dibin, heta diçin digîhîjne qeza Qersê, navça Elegezê, bajarên Tilbîsê, Lênîngiradê, Moskovayê, herba Almaniya-Sovêtê. Behsa bi dehan qehremanên nêgatîv û pozîtîv, bûyerên biçûk û mezin tînin kirin. Gelek erf-edet, eyd, şîn, şayî bi hûrgilî hatine nivîsar... Mesele dema derheq mirina Xudêda da dinivîse usan bi hostatî derbazkirina şîna wî û hildana cinyaz şîro dike, tê bêjî dîdemê şîne li cem Kurdên Êzdî tîne li ber çavê xwendevanan. Çawa ser ciniyaz distirên, kotelê çawa girêdidin, jin guliyê xwe dibirin didin ser ciniyaz, hewarî çawa tînin û wan çî cûreyî pêşniyaz dikin, xêrê çawa didin. Wusa jî qelen birîn, dewat, bindarûka cîwanan, eyda beranberdanê, berodan, eyda da li nav gund gera kosegeldiyan û gelek tiştên din. Evan tiştên êtnogirafî-debê yê wusan in, ku niha gelek hatine jibîrkirin...

Zimanê romanê paqij e, zelal û dewlemend e, akîla gilîkirina wî rast wek ya çîrokbêja ne. Dema xwendina romanê meriv nikare ji şirovekirina bûyerên hewaskar biqete. Suruşt di bin qelema wî da tê bêjî hişyar dibe, reng û rewşên bedew e nedîtî xwe dike û xwendevan heyr dihê. Dîdemên cîwane delal, yê xezaya çîya û baniyê Serhedê romanê da pir in, Dema dixwîni her demsala wî welatî bi bedewî, xêr-bêr û diwariyên xwe tînin ber çavan.

Bi tomerî ev roman bi bûyeran dagirtî û kûr e, jiyana gelê Kurd ya wê demê dîrokî, pîr dijwar û bi guhestinên bingeîn tije destnîşan dike, li ser wan destanên û pêşdaçûyîna disekîne, kîjan hukumdariya bolşevîka dane wê para Kurdan.

Nivîskar bi tebiyên réalîzma sosiyalîstiyê nêzîkî bûyeran û qehremanên xwe dibe, nivîsara xwe da bi temamî siyasî ye, rind tê xanê ku ew komûnîst e... Dicedîne nîşan bide, ku qehremanên wî yê pozîtîv tim serketî û her katî da heq bin. Ewan xeyset

va bêqisûr in, rem in, xebatçî û paqij in, zane ne. Ji bo heqiyê, pêşdaçûyîne, edlayê, dostaniya gelên bindest şerkariyê dikin. Bî fikira wî serketin û pêşketina civakê tenê bi riya siyasiya komûnîstiyê kare miyaserbe. Ew bawer e, ku tek bi baweriyên markisîzm-lênînîzmê, riya sosyalîzmê gelên wek Kurda, yên bindest, karin azadbin...

Qelsayî û kêmanyên Romanê ji hene:

-Romanê, tê bêjî cêrga bûyerên li pey hev rêzkirîne. Rêyeke aliyê nivîskar da kivşkirî, yan pilankirî, kîjanê ra gotî bûyer pêşda herin û xwendevana pey xwe bivin, nayê xane.

-Carna bûyerên ne pêwîst tên dikevin li nav romanê û xwendina wê giran û zemet dikin. Eger bûyerên wusan û wan va girêdayî hinek par-perçe ji romanê bên derketin, bi texmîna min nivîsar tu ziyane navîne.

-Di nav zimanê romanê yê delal da, carna hevokên şaşê, ne kurmançî tên xanê, tê bêjî ji zimanê Ermenî yan Rûsî xirav wergerandî ne.

Romana Erebe Şemo "JIYANA BEXTEWAR" bi zimanê Rûsî û Ermenî hatiye wergerandin. (Rûsî: werger M. Dêmîdova û M. Çêçanovskî, Moskivayê da, sala 1965-a hatye weşandin, bi zimanê Ermenî: werger V. Girîgoryan, Yêrêvanê da bi du cilda hatiye çapkirin. Cilda ewlin sala 1961-ê, ya dua 1964-a).

Romana "HOPO" berdewana romana "JIYANA BEXTEWAR" e. Naveroka wê jiyana gundê Kurda, ya kolozê ye... Emerîk û gundiyên din kolxozê da bi hevra, kolêktivî dixebitin, Sihîd ji serokatiya nehiyê pêşda dikşînin xebata partiyayê ye bilind li Yêrêvanê. Cîwanên gundên Kurda êdî diçine xwendina bilind, diqedînin, dibin pêşekzan, vedigerin karê kolxozê xwe. Emerîkê kal dimire.

Nivîskar dixwaze li dor jiyana û evîndariya

Zînê û Hesen, yên ku xwendin xilaz kirine hatine wan kolxozên gundên Kurda da çawa pêşekzanê malhebûna gundîtiyê dixebitin, konfilîkta ji bo demezirandina romanê çêke, lê nayê standin... Bûyerê romanê kûr nînin. Gelekî sade û tenik, serra û sar in... Tê xanê ku nivîskar gelekî ji civaka gund, pîrsgirêkên jiyana nû dûr ketiye. Parên romanê, şirovekirina bûyeran gotarên rojnema "RIYA TEZE" da weşandî yên ne ewqas serketî tînine bîra mirov. Kîjana da tenê pesin û destanên ên jiyana nû dihate nîşandayîn. Lê çî bi rastî gund da diqewimî nedihate gotin.

Sala 1965-an li Yêrêvanê romana wî ya bi sernivîsa **DIMDIM** hate weşandin. Weşandina vê romanê bûyereke berbiçev bû di nav edebiyeta Kurdên Sovêtê da. Ew yek ji wan nivîsarên bedewetiyê ya dîrokî ye ewlin e, ne ku tenê li nav edebiyeta Kurdê Sovêtê lê ya temamiya Kurdan da. Ji bo romanê çawa hîm destan, beyt-serhatiya zargotina gele Kurd, ya bi nav û deng "KELA DIMDIM" hatiye hildan.

Ev beyt-serhatiya di nav zargotina Kurdên Sovêtê da pir hizkiriye, oda da, di nav civaka da tim dihate gotin. Çîrokbêjan him bi stiran, him bi cûrê şirovekirinê digotin. Gelek şaxên (variyanên) wê aliyê Kurdzanê va ji nav gel hatine nivîsandin û çapkirin. Hinek helbestvanên Kurdê Sovêtê, wa gotî, ew veçêkirine û xwe ra kirine poyem-destan... Lê gerekê bi heqî bê gotin qîmetê wan nivîsarên ku ser naveroka beyt-serhatiyên gelêrî, (ne ku tenê DIMDIM usan jî yên din) ji aliyê nivîskarên Kurdên Sovêtê da hatine nivîsar (veçêkirin) pîr nimz e. Bawerkî ji her aliyê efrandariyê va ew ji yê gelêrî dadixin.

Ev destana usan ji aliyê helbestvanê eyan Fêrîkê Êsiv va çawa radyokompozîsiya hatiye amadekirin û bi radyoya Yêrêvanê salên dirêj hatiye dayîn. (Ez nîzanim ew

radio kompozîsiya berî weşena romana Erebe Şemo pêk hatiye yan pey ra). Ew radio kompozîsiya efradineke giranbiha ya serketî ye.

Gerekê bi rastî bê gotin romana Erebe Şemo ji wan cuda dibe. Mezmezka destana gelêrî romanê da hatiye xweyîkirin. Bûyer, nexş, ewaz tev dora wê mezmezka hûnandiyê, xemleke kurmancî ya bi dilê xwe lê kiriye û heykelekî edebîyî nemir gelê xwe ra efrandiyê.

Serketin
û bihêzbûna
xweyê kela
D i m d i m ,
Xanê Kurda,
X a n o y ê
Çengzêrîn ji
Şahê Îranê xweş
nayê. Kela Dimdim
bûye dergekî pola,
ciyê tifaq û yekîtiya
Kurdan. Berê ew
çend serleşkerên xwe
yên cêribandî bi ordiya
leşkerê giran dişîne ser
kela Xanê Çengzêrîn,
Kurd leşkerên dagerkirên
neheq dipelçiqîn, serleşker
serşikestî, senesi paşda
direvin cem xweyê xwe, tek b i
xweyîtiya Mehmûdê Merkanî kela
Dimdim dikeve.


Romannivîs ew çîrokên xiyalî, fantastîk, ku destana gelêrî da hene derheqa dîtina zêra, çêkirina kelê, dor navê peyva “çengzêrîn” û bûyerên din, yên nayêne biharkirin daye alîkî, ji romanê derxistiye, naverokeke hewaskare rêalîstî efrandiyê.

Romanê da kela Dimdime bi çarşû,

bazar, dukan, qawexane, hostexane, kûçe û meydanên xwe mîna dîdemekî zêndî têne li ber çavê xwemdevana. Nivîskar ew wusan nitirandine ku tê bêjî kela Dimdim bajarekî hasêyî, bedewî biçûk e. Dorê gund û eşîrê Kurdan in. Xelqê xebathiz kar û barê xwe va mijûl in. Surra mezinayî û serketina Xanê Çengzêrîn ewe, ku ew aliye heqiyê û qencyê ye. Xwestina wî edlayî û aramiya welatê wê ye... Yekîti û tifaqê xelqê Kurd yê wê heremê kirine mîna kulmeke pola. Kurd xêncî biratiyê, wekeheviyê jiyana edil tu tîştî ji kesî naxwazin û nahêle tu qewat azaya wan ji wan bistîne. Lê...

Alîkî kela
Dimdima azadihiz
e aliye din
Tehrana rengin
da Şahê Ecemî
devxwînî bi
qetil û qan e.
Dewata Şah
e... Xwedê
z a n e
d e w a t a
wî ya çenda
ne. Bûk keçeke
çardasalî ye... Dewatê da jî Şah
û neyarên Kurda derheqa wêrankirigna
kela DIMDIM da difikirin... Şênbûn û
azaya wî warê Kurda tirs û kîn kirine dilê
Tehranê. Bi riya cesûsa, dek û fena, zorê,
kuştinê, hevkarîya tev Sultanê Romê...
Her mecal tê cêribandin ku Kurda li nav
xûnê da bipelçiqîn. Nivîskar bi nimûnan
xwemdevana dide bawer kirin, ku eger tifaq
nav Kurda da hebe, Kurd piştê hev bigrin,
xweyî li hev derkevin kes wana nikare...

Romanê da xêncî Xanoyê Çengzêrîn
xwemdevan rastî gelek qehremanên hizkirî



tê yê mîna Hemze Çawûş, Xaçoyê Ermenî ku topa çê dike, Koçoyê Kal, Mîr Sadiq, Şêx Zade, Cewzo, Sêvdînê lawê Xano, Zadîna jina Posto, Dîlber û gelekên din... Usa jî li ber xwendevanan tê bêjî derê dîwana Şahê Ecem: Şah Abas vedibe. wur tirs-xofê, qelpîtiyê, kînê, neyartiya dizîva ne, ya diji hev...

Eger nivîskar ra mecal hebûna biçûya ciyê kelefê kela Dimdimê, ew ciyê bûyerên dîrokî qewimî bi çavê xwe bidîta, belgeyên dîrokî biketana dêst, lêkolîna pêwîst bikira, ez bawer im romanê bi cûrêkî din bihata nivîsar û wê qîmetê romanê bilindtir bibiya... Lê wê demê kê ew bext dabû nivîskarê Kurd, ku karibe ji hidûdên Sovêtê yê pola derkeve, bigîhîje wan warên Kurdistanê, welatê kal-bavan...

Romana DIMDIM bi zimanê Rûsî, Ermenî û gelek zmanê din hatiye wergerandin û weşandin.

Erebê Şemo xêncî van roman û nivîsaran usa jî seva zarokan çîrok nivîsîne, bi miqale, gotaran, bîrnînan rojneme û kovarên komarên Ermenistanê û Rûsiyayê da pêşda hatiye. Bi sênariyoya wî filmeke dokûmêntal bi navê "KURDÊN ERMENISTANÊ" hatiye kişandin.

Çiqas jî film pesin û piropaganda jiyana Sovêtê ye, dîsa ew ji wan degme dokûmêntan e, ji kîderê ewled karin gelek rewşembirên Kurde wê demê bi zêndî bivînin.

Emekê Erebe Şemo pirr e di warê pêşxistina kûltûra Kurdên Sovêtê da. Ew evdekî xweyê zanebûnên kûr û kûltûra bilind bû, pêşewiteki gelê xwe bû. Bi zaroka ra zarok bû, mezina ra mezin. Tim di civat û êvariyan nivîskar û xwendvanên Kurdên Ermenistanê da hazir bû, bi şêwrên qenc alîkarî dida efradarên gênc.

Derê wî miqîm li ber teva vekirî bû. Ji gundan, bajaran Kurdên karker, gundî, xwendevan dihatin cem. Alî teva dikir.

Cawa li Ermenistanê wusan jî temamiya welatê Sovêtê da qedirekî mezin didane wî. Navê xebatçiyê kûlturayî î emekdar yê Ermenistana Sovêtê dabûnê. Wê demê navê wa didane rewşenbirên Ermenistanê yên here bi nav û deng, xweyê emekê mezin. Ji bo kar û berhemên giranbiha ew ji aliyê dewleta Sovêtê da hêjayî du ordênên welêtî herî bilind: "Dostaniya gelan" û "Ala Sor" bûye.

Ji pey mirina wî ra hukumata komara Ermenistanê xelata lîteratûrî ya li ser navê wî kivş kirin. Ew xelat didane wan nivîskaran yên berhemên Kurdiye giranbiha efrandibûn û weşandibûn... Xelata pêşin nivîskar Wezîrê Eşo sitend...

Havîna sala 1978 an bû.

Di serake bajarê Yêrêvanê, ya mezin û dora wê xelk kimkimî bûn. Bawerkî temamiya serkarên Ermenistanê hatibûn wur. Nivîskarên Ermenistanê tev û serokatiya yekîtiya nivîskarên komarê li wur bûn. Ji gund û bajarê Ermenistanê, Gurcistanê, Azebaycanê Kurd hatibûn. Ji dest xelkê (hewaryan) ciyê vala tune bû. Cara ewlin ewqas xelkê Kurd li cîkî top dibûn. Jora salonê tabût wî di nav kulîlka da pêçayî bû. Teyê bigota nivîskar tabûtê da raza ye. Jinên Kurdan bi kincên netewiyê li rex cinyêz rûniştibûn, şîn dikirin, dinivandin.

Wê rojê jî di pantîona Goristana Yêrêvanê, ya Sovêtaşênê, kîderê mirovên komarê yên bi nav û deng defin dikirin, me EREBÊ ŞEMO tesmîlî axê kir.

Nivîskarê Kurdî mezin wusa hate dinê û çû.

Di binê bandora sîyasetê û çapemenîyê de huner



Mazhar KARA

Ji hingî tê bîra min, hingî min xwe nas-kirîye û virde, ji rojhilata navîn şer û pevçûn kêr nebûn e. Ev erdnîgar hertim germ e, dikeliye. Ne aştî, ne edlayî û ne jî demok-rasî rîya xwe bi wanderan dixîne. Ma ev yek qedera vê erdnîgarê ye? Na, ez ne di wê bawerîyê de me.

Naxêr, ev rewşa xirab, ev tarîya bêdawî ne qeder e. Lewra aştî jî, edlayî jî, demoq-rasî jî berhemên mirovanin. Ji ezmannan debi zembî ve nayêne xwarê. Ew bi keda ci-vatan, bi afirandinên wan, bi erkên wanên hunerî, çandî û zanistî ve dikemilin. Ew civakên gihîştî, ew civatên xwedî sazî û rêxistinên jîr, zanist, hunermend, afiranêr û pisporan pêk tên dikarin pirs û pirsgerêkên xwe bi hêsayî zelalbikin û wan re çareyan bibinin û wan ji holê rabikin. Lê ya livê erdnîgarê ya kêr jî ev e. Ango kêmasîya çalekiyên hişmendi, kêmasîya civateka pêş-keî; kêmasîya aştîyê, kêmasîya aramîyê, kêmasî edlayê û demokrasîyê ye.

* * *

Çewa ku ji sernivîsê jî xwiyaye û tê

femkirinê babeta vê nivîsê “Di bin bandora siyasetê û çapemenîyê de huner” e.

Her çiqas rojeva welat a sîyasi, aborî û çivakî germbe, bi kekel û aloz, bi şer û pevçûn, bi kuştin, qêrîn, mirin, koçbarî û berxwedana li dij zilm û zorê be jî, me xwest li vê babetê hûrbîn û wê binivîsîn. Dibe ku ev babeta çihê, ji bona xwendevanê kovarê bibe bêhnberdaneke piçûk û rojevê piçêkî nermbikin! Zanim ku giranîya nivîs-karên kovara Dengê dê di derbarê rojeva germ de bivîsin. Ê dizanim ew divî warê de pispor in, serkeftî û mahîr in. Dîsa di-zanim kû ew ê di derheq wan bûyerê di wan çendên dawî de ku li welat (bêtir ji Referanduma Başûrê Kurdistanê -ew bi sere xwe gaveke dîroki û zêrîn e- û rûdanên di dû wî re, ixaneta Kerkûkê û hwd.) û li dine rû dane wê baş binirxînin û wan bûyer û bûyûnan ji bona me zelal bikin.

Lê sedemeka min a din jî heye ji bona nivîsandina vê babetê. Ew jî ev e. Ez bawer-in ku ew civatên ku çand û hunera wan jar û lawaz e ew tû car nikarin şerbeta azadî û demokrasîyê firbikin. Wek me li jorê jî

bi çend rêzan anî ziman, ev civatên, milêtên ku, sazîyên wanên çandî, hunerî û zanistî çênebûbin, negihîştibin, tim bîndestin, jar û belengazîn. Ew civatên, milêtên xwedî dewlet û sazîyên wanên çandî û hunerî di bin bandora sîyaseta rojane û ya çapemenîyê de bin, ew tu carî nikarin tenê bi sîyaseteke hişk ve derd û kulên xwe, pirs û pîrsgirêkên xwe yê civakî çareser bikin. Ev rastîyek e. Weka me di despêkê jî nivîsi, girîngîya duduyan ya vê babetê ji daxwaza destnîşankirin û balkişandina ser vê babetê ye.

Mixabin ku Gelê Kurd jî yek ji wan milêtan, civatan e ku, ji sazîyên çandî, hunerî û zanistî yê pêşketî mehrûm e. Mixabin ku civata me hetanî îro di bin banê komareke modern de rêz nebûye. Bi rastî, dagirkeran nehîştîye ku hetanî iro em di bin banê dewleteke modern de rêzbibin û wan sazîyên xwe yê ji bona pêşketinê pêwîst avabikin. Ji bonê balkişandina ser vê babetê Beybûn proksiyonê li Îstenbolê ew yek kir babet ji bona gotebêjek girîng ku axavtvanê wê gotebêjê jî ez bûm.

Me roja 03/11/1017 an li Îstenbolê di avaya Su Göteri Merkezîyê de, bi birêz Îsmail Beşikçi, Yılmaz Odabaşı û Îhsan Gümüşten re di gotebêja bi navê “ di bin bandora sîyaseta û medyayê de huner ” gotebêjek pêk anî.

Zimanê gotebêjê bi Tirkî bû. Min jî di derheq babetê de hazîrîyek kir. Min di wê xebatê de ji kûrahî dîroka mirovatî de dest pêkir. Derbarê wê rola ku huner ji destpêka pêvejoya ronesansê û virde di guhertin û pêşketina civakan de leyistîye de metneke berfireh derkete holê. Lê belê di piratîkê de gotebêj li ser vê riknê nemeşîya. Lewra, her mêvanek, gotarvanek xwedî şan û şî, xwedî biranşeke balkêş bûn. Her yek pisporê cûreyek çandê bûn. Disa her axavtvanek di demeke jîyana xwe de bi sîyaseta û medyayê

re jî bilîbûyî bûn. Ku mirov çev davêje jîyana van, dixwîyê ku, wana pîrê jîyana xwe di nava çalekîyên medyayê, sîyaseta, çand û hunerê de derbazkirine. Belê ne di nava medyaya serdest de, ne di nava sîyaseta desthilat de, di nava wê hunera ku, di xizmeta sazûmanê de ye bûn. Ew do jî muxalîf bûn, îro jî wisanin. Ango, jîyana wana bixwe jî di bin bandora sîyaseta û medyaya desthilat de derbazbûye.

Ku mirov ji nêzde bala xwe dide û din-hêre bira jî, hemî axavtvanan jîyana xwe di binê zixtên siyaseta desthilata, ya di xizmeta sazûmanê de, di binê zixt û zora medyaya berdevka sazîya siyaseta desthilatan de buhurandine. Îsmail Beşikçi ji ber fikr û ramanê xwe, hîjdeh salên xwe di zindanên dagirkeran de derbazkirî ye. Her wiha Yılmaz Odanbaşî jî, naçizane min jî û Îhsan jî ji zilm û zora sazûmanê gelekî para xwe hildaye. Ji ber vê yekê, min metna axavtina xwe danî alîkî û axavtina xwe li ser vê riknê meşand. Me bal kişand ser jîyana axavtvanan. Lewra jîyana wan şahidê bandora sîyaseta desthilatan, ya medyaya desthilatan e. Ew zilma desthilatdaran baştir radixe pêş çavan.

Di dû şiroveyên min de ev sewal hate holê: Gelo, li Kurdistanê bandora sîyaseta û medyayê a li ser huner nahêle çand û huner pêşkeve an lewazîya çand û huner sedemê sîyaseteke hişk û teng e? Emê di vê nivîsê de hinek jî li bersiva vê sewalê bigerin.

* * *

Dixwazim bi çend rêzan axavtinên axavtvanan binirxînim. Lewra, nirx û rexneyê di cîde ji bona pêşketina fikr û ramanê, her wiha ji bona pêşketina çand û hûnerê hewce ye. Ku em li welatê pêşketî dinhêrin, sazî rexneyên rexneyê yê herî xurt, xwedî îtibar, rûmet û hurmet in. Ku cîyê wê hat hevceye bibêjim ku em jî sazîyeke wisa jî bêparin.

Di vê çarçovê de hewce ye bibêjim ku, axavtina herî balkêş ya Birêz Beşikçi bû. Bêşikçi, disa weka caran, gotin vejeran ani ser lawazîya çand, huner, ziman û pêwendîya wîya bi bêdewletîyê. Belê, ew bi vê awayê piçek ji mijara gotebêjê dûr ket. Lê bi rastî ev dûrketin bi dile min bû. Bi rastî bibêjim rind jî bû. Ew bi vê awayî vejerîya ser qada pîsporîya xwe. A rast jî eve. Hewceye ku kê di çî warî de pîspor be bira di wê waarî de biaxive. Ji xwe mesajên di dû gotebêjê re di medyaya Kurd û medyaya muxalîf û medyaya civakî de cih girt jî gotinên wî yê ji derveyê xala destnîşankirî bûn. Bi kurtî Beşikçi di derbarê wê mijarê de wiha dibêje; “ew ziman, zimanê Kurdî ku nebe zimanê fermî pêşda naçe, xurt nabe. Bi zimanek lewaz, ziyîf wêjeyeke xurt, hunereke xurt pêk nayê. Kurdistan ji alîyên çar dewletên dagirker ve hatîye dagirtinê. Her dewleteke dagirker li dijî zimanê Kurdî bi tewreke nedîtî zixtên giran, çerxeka giran a asimilasyonê pêk tîne. Û xwiyaye kurdi jî di nava van şert û mercên bindestîyê de, di demeke kinde nikarin di vê derheqê de rewşeke pozîtîf jî derxine holê. Ji ber vê yekê, ji bona şikandina çerxa asimilasyonê, ji bona xilasîya zimanê kurdî û ji bona pêşketina çand û hunerê dibê her maleke kurdan ji bona zimanê Kurdî bibe dibistanek.”

Beşikçi di vî derheqê de ji dîrokê de wekok anin. Rewşa Lehistanê (Holanda) a sedsala borî û rewşa Kurdistanê da ber hev, şibande hev. Got; “dibe Kurd ji bona xilasîya zimanê Kurdî ji serpêhatîyên zimanê Lehan, ji rewşa wîya sedsala borî dersan derînin. Wexta Lehistan ji alîyê sê dewletên dagirker ve hatine dagirkirinê, Lehan her maleke xwe weka dibistaneke zimanê lehî karanî û zimanê xwe weka zimanekê pêşketî parastin û xurt kirin.”

Di dû Beşikçi re Yilmaz Odabaşî axavt. Axavtina Birêz Odabaşî jî li derveyê xala destnîşankirî axivî. Birastî wî jî weka cajan

ji trûbînê ra axivî. Wî jî qala nivîsên xwe, serpêhatîyên xwe kir. Dîsa lomên xwe kir, gazine xwe li rêxistinên Kurd kir. Got; “nivîsên min naxwînin, pirtûkên min nastînin, venagerînin Kurdî û hwd.”

Yilmaz sedemê bi Tirkî nivîsandina xwe anî ziman. Disa weka caran hinek serkêş û hinek arabesk bû. Weka şeweyên hehbesta xwe. Lewra Yilmaz ji nifşa heştê ye. Ewî jî weka gelek şairê nifşa xwe di hepsê de dest bi nivîsa helbestan kiribû. Aliyeke wê nifşê fîrk û ramanên siyaseta çep, ji çanda berxwedanê, azadî aşîyê û piçekî jî çanda arabesk a ku, di wan salande populer bû.

Yilmaz bêtir li ser sedemê bi Tirkî nivîsandina xwe rawestîya. Wisa xwiyakir ku ev piçek ji gotinên Beşikçi yên di derheq pêwîstiya nivîsandina bi zimanê Kurdî acizbû. Ku hinek rexneyên bi wî tewrê ji beşdaran jî hatin jê re.

İhsan GÜMÜŞTEN şanovan e. Ew li Batmanê derhênerîya Şanoya Tov dike. Min berê jî çend leystikên wan guhdar kiribû. Balkêş û jêjetî bûn. Ji bona pêşeroja şano û sinema Kurd hêvîyê germ dike. Gümüştên jî di derbarê xebatên xweyê şanogerîyê de axivî. Wî bi kurtasî wiha got; “ji bo jiyanê û serkeftinê ken pêwîst e. Em mirova didne kenandinê.”

* * *

Bi ya min, İhsan bi vê gotina xwe binê pêwîstîyêke girîng a Gelê Kurd bî qelemeke sor ve, bi xêzeke qalind ve xêz kir.

Ew tabloya di dû wê gotebêjê re derkete holê, fotoxrafê belawelabûn û lewazîya jiyan meya çandî û hunerî ye.

Belê destnîşankirinên Birêz Beşikçi yên di derheq bêdewletbûnê rasti û di cîde nin. Lê bi ya min ew qudreta ku dikare derê rêzbûneke bi rêk û pêk vedike û dewletbûnê bi xwe re tîne xurtbûn û pêşketina huner e. Huner, çand û çalekiyên zanistî yên nûjen û

hihîştî derfet û alavên nûjen dixê xizmeta sazîya sîyasî. Siyasetê jî nûjen, xurtî û bi hêz dike. Ev yek jî dikare bi xwe re erkên xwe-birêvebirinê, dewletbûnê derxîne holê.

Di dû wan destnîşankirinan re, dikarin bibêji ku, berpirsîyariya sazîya sîyasetê ya

herî girîng alîkirin û rêlibervekirina xebatên çand û hûnera Kurd e. Dengê sewala ka çewa tê guhê min. Ji bona bersiva wê sewalê Beşikçi di vê gotebêja xwe de reçeteyek baş nivîsî. Bersiveke berfireh babeta nivîseke din e.

Kadim Ermeni yerleşkelerinde hüzünlü bir gezinti



Mehmet BAYRAK

Kimi Ermeni tarihçiler Ermeni ülkesini, “2700 yıllık tarihiyle kültürel, siyasal ve coğrafik bir varlık olarak Fırat ırmağının doğusunda yer alır; kuzeybatıda Çoruh ırmağı, kuzeyde Kura ırmağı, doğu ve güneydoğuda Aras ırmağı ve Urmiye gölü ve güneyde Dicle vadisi ile çevrelenen” bir bölge olarak nitelendirirler. (1)

Kuşkusuz bu, Ermeniler’in çıkış noktasına ilişkin bir belirlemedir yoksa Polonyalı Ermeni gezgin Simeon’un da daha 17. Yüzyılda vurguladığı gibi, bu topraklardan Balkanlar’a kadar bir yayılım sözkonusudur. Hatta kimi görüşlere göre de Ermeniler aslen Orta Anadolu’dan Kapadokya bölgesinden çıkıp yayılmışlardır.

Çıkış yerleri ne olursa olsun, bilinmektedir ki zamanla göç hareketleri dolayısıyla çeşitli bölgelere bir akış gerçekleşmiş, ancak 1915 Soykırımıyla bu süreçte büyük bir kırılma yaşanmıştır. Bu trajik süreçle birlikte, kurtulabilen Ermeniler neredeyse Dünyanın her yerine dağılmışlardır. Bugün bütün kıtalarda Anadolulu ya da

Kürdistanlı Ermeniler’e rastlanabileceği gibi; günümüz Ermenistan’ında da Erivan’a bağlı “Arapgir, Maraş, Malatya, Van” gibi yerleşim birimleri kurulmuş bulunmaktadır. “Ermenistan’daki Anadolu” olarak nitelendirilen bu oluşum, herhalde geçmişi yaşatmaya dönük bir arzunun ürünü olmalıdır. (2)

1915 Öncesi Osmanlı İmparatorluğu’nda, Ermeniler’in geniş bir coğrafyaya yayıldıkları biliniyor ve bu gerçeklik görsel ürünlerle de sergilenebiliyor. Sözelimi Soykırım öncesi Adana, Amasya, Gümüşhane, Çorum, Merzifon, Harput, Erzurum, Urfa, Kayseri, Sivas, Yozgat, Eskişehir, Van gibi illerde önemli bir Ermeni varlığı sözkonusuydu. Devlet, Ermeni nüfusunun (1.229.000) olduğunu savunurken; Ermeni Patrikhanesi bu nüfusu (1.914.620) olarak veriyordu.

Hemen tümü bölgesel elzanaatlarıyla ve ticaretle uğraşan Ermeniler’in birkaç şehir bazında vereceğimiz nüfus ve okul sayıları, tüm bu yerleşkelerdeki Ermeni varlığı konusunda bize açık bir fikir verecektir.

Adana'da 83.733 Ermeni nüfusu, 89 kilise, 65 okul; Urfa'da 41.740 Ermeni nüfusu, 11 kilise, 20 okul; Kayseri'de 52.000 Ermeni nüfusu, 47 kilise, 56 okul; Sivas'da 116.817 Ermeni nüfusu, 198 kilise, 204 okul; Yozgat'ta 58.611 Ermeni nüfusu, 49 kilise, 42 okul; Eskişehir'de 4.510 Ermeni nüfusu, 1 kilise, 2 okul; Van'da 110.897 Ermeni nüfusu, 55 manastır, 399 kilise, 30 okul. (3)

Şu sınırlı örnekte de görüldüğü gibi, bu yerleşkelerde önemli bir Ermeni varlığı söz konusudur. Ancak biz bu şehirlerin ve altbirimlerinin ayrıntısına girmeden, bu gezintimizde Agos Gazetesindeki bir çağrıyı esas almak istiyoruz.

Agos Gazetesinin sözkonusu çağırısı şöyle: *“Adıyamanlı, Amasyalı, Arapgirli, Dersimli, Diyarbakırlı, Harputlu, Hemşinli, İstanbullu, Kastamonulu, Kayserili, Malatyalı, Musadağlı, Sasonlu, Sinoplu, Sivaslı, Tokatlı ve Zaralı Ermeniler Surp Hagop'u Kutluyor...”* (4)

Şehirlerle Özdeşleşen İsimler ve Metruk Kültür Varlıkları

Şunu hemen belirtelim ki, burada Türkçe bilinen isimlerini kullanacağımız şehirlerin hemen tümünün Kürtçe dahil başka dillerde de karşılıkları vardır. Sözelimi **Adıyaman**, Kürtçe **“Semsur”** olarak biliniyor. Sonradan il olup, Urfa'ya ve Maraş'a komşu olan Adıyaman, geçmişte Ermeniler'in de yaşadığı bir yerleşke. Bu şehirle özdeşleşen isim ise, sürgün yaşamından sonra Fransa'da Nazilere karşı direnişin sembolü olan Ermeni şair ve işçi önderi **Misak Manuşyan**'dır. (5)

1906'da Adıyaman'da doğan Misak Manuşyan, bir komünist şair ve direnişçidir. II. Dünya Savaşı sırasında Fransa'da faşizme karşı savaşıırken, yakalanıp kurşuna dizilen Manuşyan, daha 19 yaşındayken Ermeni

soykırımı sonrası Fransa'ya göç eden bir ailenin çocuğudur.

Amasya, geçmişte **Hüseyin Hüsameddin**'in *“Amasya Tarihi”* başta olmak üzere birçok esere konu olduğu halde, günümüzde tarihi yeterince bilince çıkarılmayan bir şehirdir. Birçok tarihi mağara yerleşkelerinin yanı sıra önemli bir kültür varlığı Amasya Evleri'dir. (6)

Bizim açımızdan önemli olan bir özelliği de, Amasya'da 2400 yıllık **Zerdüşt Tapınağı**'nın ortaya çıkarılmasıdır. Prof. Dr. Şevket Dönmez yönetiminde 10 yıldır sürdürülen kazı çalışmaları sonucunda, M.Ö 425- 400 yıllarında yapıldığı tahmin edilen Zerdüştler'e ait bir Kutsal Ateş Tapınağı ortaya çıkarılmış durumda. (7)

Konumuzu ilgilendiren bir başka haberse, Hrant Dink ile aynı yetimhanede kalmış olan *“Amasya'nın Son Ermenisi”* **Rafael Altunyan**'la ilgili. Ermeni kökenli CHP İstanbul Milletvekili **Selina Doğan**, bir çalışma çerçevesinde Amasya'nın ayakta bıcılık yapan son Ermeni'sini ziyaret ediyor ve duygusal bir görüşme yaşıyor. Zaten Seline Doğan'ın ailesi de Amasya'nın Gümüşhacıköy ve Merzifon'unda yaşadıkten sonra İstanbul'a göçüyor. (8)

Arapgir ve bir bütün olarak Malatya, geçmişte Ermeniler'in yoğun olarak yaşadıkları yerleşkeler arasında. Hrant Dink'in ve geçmişte yetişmiş birçok Ermeni aydınının memleketi aynı zamanda. Ancak, ne yazık ki bu yerleşkelerdeki kiliseler de ya yok edilmiş ya da yıkıma terkedilmiş. Hranlar'ın kilisesi Taşhoron Kilisesi de bunlardan biri. Hatta, Tekirdağ'ın Malkara ilçesindeki Ermeni mezarlığı nasıl meyhane- pavyon yapılmak üzere yıkıma tabi tutulmuşsa; Garo Paylan'ın dediğine göre Malatya'daki bir kilise de genelev olarak kullanılmış.

Şimdilerde, Malatya Hay-Der

bölgedeki kültür varlıklarını korumaya ve insan unsurunu ortaya çıkarmaya dönük çalışmalar yapıyor. (9) Çünkü bu yöreler, asimilasyonun ve “ihtida”nın en etkili olduğu yerler. Üstelik, bugün en dindar, giderek “softa” olarak bilinen yerleşkeler. Bunlardan biri de Darende... Buraya ilişkin küçük bir anı.

2015 Yılında bir konferans için İsveç-Stockholm Alevi Kültür Merkezi'ndeyim. Toplantı öncesi bir bayan arkadaş yaklaşıp, “*Hocam, size babamın bir müzik Albümünü vermek istiyorum*” diyor. Bakıyorum, Kalan Müzik'in “Arşiv” serisinden çıkan **Mustafa Zengin**'in albümü. Kendisini geçmişte, TRT'nin mahalli sanatçılarından biri olarak biliyorum. Sözgelimi, Alman halkbilimci **Ursula Reinhard**'ın, 1999'da imzaladığı Türk Âşık ve Ozanları'na ilişkin bir kasetli- kitabında da yer almıştı. (10) Reinhard, görüşmemizde; eşi **Prof. Dr. Kurt Reinhard**'la birlikte Anadolu'da alan çalışması yaparken karşılaştıkları âşık ve ozanların yüzde 60'tan fazlasının Kürt kökenli olduğunu, ancak eserlerini Türkçe icra ettiklerini söylemişti. Nitekim, Darendeli Âşık Mustafa Zengin'i de herkes Türk halk ozanı olarak biliyordu. Kızı **Solmaz Yılmaz**'ın, babasının albümünü verirken söylediklerini hiç unutmadım ve dramatik bir olgu olarak birçok yerde paylaştım.

Babasının etnik kimliğini hep Türk olarak biliyormuş. Babasından yıllar sonra annesi ölmeden bir gece açıklıyor kızına Ermeni kökenli olduğunu. Aynı şeyi, arkadaşım gazeteci **Ahmet Abakay** da yaşamış ve bir kitabına konu etmişti.

Dersim, Diyarbakır ve Harput'u (Osmanlı döneminde Mamuretülaziz), hem coğrafik özelliklerinden hem de demografik yapısından dolayı birlikte mütalaa etmek gerekir, diye düşünüyorum. Hatta bunlara **Erzincan, Erzurum, Muş ve Bingöl**'ü de

katmak gerekir. Esasen, tüm bu yerleşkeler ile Sivas ve Malatya'nın bir bölümü, Fırat havzasını oluşturmaktadır ve yerleşkelere ilişkin önemli bir külliyyat var.

İki ciltlik bu önemli yayınlardan birini, yıllar önce Munzur Festivali'nde Dersim Ermenileri'nin kitap satış reyonundan almıştım: Arsen Yarman: ***Palu- Harput 1878/ Çarsancak, Çemişgezek, Çapakçur, Erzincan, Hizan ve Civar Bölgeler***. (11)

Bu bölgenin önemli özelliklerinden biri, Ermeniler'in yanısıra çok sayıda Dersimli Kürd'ün de 19. Yüzyılın son çeyreğinden itibaren çalışma ve kazanç için Amerika'ya vukubulan göçleridir. Öyle ki, 1919'da Amerika'da bulunan ünlü sosyalist kadın yazarlardan **Sabiha Zekeriya Sertel**, daha yüzyılın başlarında bu ülkede bir “*Kürdistan Mezarlığı*” bulunduğunu anlatır.

Yazar Vahdettin Engin, o zamanlar da bazı dramatik olaylara sahne olan bir kaçak göç olayını işliyor: “*Sahtekârlar, 20. Yüzyılın başlarında kaçak yollarla Amerika'ya gitmeye çalışan özellikle Gayrimüslim Osmanlı vatandaşlarını, Amerika yerine Yunanistan'da yüzüstü bırakmışlardı.*” (12)

Soykırım öncesi bu havzada önemli bir Ermeni varlığının bulunduğu bilinmektedir. Dersim'in Alevi Kürtler'i katliam aşamasında Ermeniler'e kol- kanat gerip, 25 binden fazla Ermeni'yi Rusya tarafına geçirirken ne yazık ki diğer unsurlar bu durumlara göstermezler. Bundan dolayı da bu coğrafyada yer alan ve terkedilmek zorunda kalan bu “metruk” yapılar, büyük bir yıkıma ve talana maruz kalır ve bu yağma günümüzde de devam etmektedir.

Kuşkusuz, bölgeden sürgüne giden Ermeniler, yaşadıklarını çeşitli kitaplarla da bilince çıkardılar. Bunlardan biri, **Mardiros Hamparzoum Çitçian**'ın “*Ölüme Kıl Payı/ Ermeni Soykırımından Kurtulmuş*

Birinin Anıları” (Belge yay. 2009), bir başkası **Osep Tokat**’ın **“Virane Kığı”** adlı kitabı, bir diğeriye Çemişgezek’ten Los Angeles’a giden **Aurora Mardiganian**’ın **“The Story of Aurora Mardiganian”** adıyla kaleme alınan hayat hikâyesidir. Ermeni kadını Mardiganian, *“Dersimli Kürtler sayesinde kurtulduğunu, tüm hayatı boyunca anlattığını”* bildirmektedir. (13)

Konuya ilişkin önemli bir kitap da, doğrudan tanıdığım İsviçre’li bilimadamı **Hans Lukas- Kieser**’e ait. Dersimli **Mission Johannes’in** 1897’den 1926’ya kadar Dersim, Erzurum, Erzincan, Harput ve Diyarbakır’daki yaşam izlenim notları, sonradan oğlu Lukas Kiesser tarafından kitap olarak yayımlanıyor: **Mission’un** Özgürlüğü ve Etnik Arındırmada Türkiye, Zürich, 2000

Kitapta, bölge Kürtleri’ne ilişkin ilginç gözlem ve anekdotlar yer alıyor. Bunlardan birinde şöyle deniyor: *“Kapı komşumuz mazlum Kürtler ise bizimle aynı telaş içinde. Bir yandan bize yapılanları düşünüyorlar, bir yandan kendi canlarını düşünmenin ezikliği içinde yardım yolları arıyorlardı.”* (14)

Türkiyeli Ermeni yazar **Raffi Kantian**’ın, *“tarihte kötü şeyleri unutmamak ama olumlu şeyleri sürekli hatırlamak gerektiğine”* ilişkin vurgusu bu olmalı. (15)

Marmara ve ege bölgesindeki birçok şehrin yanı sıra Karadeniz’deki kimi yerleşkelerde de Ermeniler’e ait bugün yokolmaya terk edilmiş çeşitli tarih varlıklarıyla, sınırlı da olsa insan unsurunun hayatını idame ettirdiği biliniyor. Gülümseyerek anımsıyorum, İzmir’deki bir panel sonrasında HDP Milletvekili **Garı Paylan**, Sinoplu bir Ermeni öğretmeni tanıştırmıştı bizimle: Adı “Osman”... Trabzon ve Kastamonu’daki kimi yerleşkeler de bu türden. Sözgelimi, Kastamonu- Taşköprü’nün Kapaklı ve Tutenli köylerinde “Poşalar” olarak adlandırılan Ermeniler’in yaşadığını görebiliyoruz.

(16) Yine Rize’nin Çamlıhemşin ilçesinde Hemşin Ermenileri’nin baskılanmış olarak yaşamaya tutunduklarını izliyoruz. (17)

Afyon, Kütahya, İzmir gibi Ege şehirlerinin yanı sıra, başta İstanbul ve Bursa olmak üzere birçok **Ermeni Âşuğu**’nun yetiştiği Marmara hattındaki birçok şehir de eski Ermeni yerleşkelerinden. Bir inceleme- yazısında, *“Bursa’nın (Öteki Tarih)inden Sayfalar”* aktarıldığı gibi (18); Soykırımdan kaçıp 1920’lerde Fransa’ya yerleşen Paris doğumlu Ermeni çevirmen ve deneme yazarı **Janine Altounian**, babasının ölümünden sonra herşeyi güncesinde bulup, öğrendiğini anlatıyor. (19)

Paytaht İstanbul’a gelince, şehri adeta yeniden inşa eden Ermeni mimarlar **Mimar Sinan** ve **Balyanlar** başta olmak üzere; bu şehir adeta Müslüman olmayan halklarla özdeşleşmiş durumdaydı. Diğer halklar gibi Ermeniler açısından da bir eğitim ve kültür merkezi olan İstanbul’un, Lozan gibi anlaşmalara rağmen nereden nereye geldiğini göstermek için sadece Azınlık Okulları’nın durumunu görmek yeterli. Tarih Vakfı’nın yaptığı araştırmalara göre; Osmanlı’nın son yıllarında 6.437 olan Azınlık Okulu sayısı günümüzde 22’ye düşmüş durumda. (20)

Memleketleriyle Anılan Ermeni Âşuğlar

Gerek paytaht **İstanbul**’un gerek Kürdistan’ın merkezi kültür şehri **Diyarbakır**’ın, gerekse **Kayseri- Maraş- Sivas- Tokat** hattının, özellikle **Ermeni Âşuğlar** açısından önemli merkezler olduğunu biliyoruz. Sözgelimi, arşivine ulaştığımız, konunun önemli uzmanlarından **Toros Azadyan**, o zaman tesbit ettiği tüm Âşuğları, alfabe sırasına göre memleketleriyle birlikte anmaktadır:

Üsküdarlı **Agâhi**, Silivri’li **Ahteri**, İstanbullu **Arutin**, Kafkaslı **Arutin**, Harputlu

Aşkîya, Şebinkarahisarlı **Aşkîya**, Sivaslı **Ayani**, Diyarbakırlı **Ğazar**/ **Azad Kalfa**, Asitaneli/ İstanbullu **Bahari**, Kayserili **Garabed**, Harputlu **Ceryanoğlu**, Asitaneli/ İstanbullu **Cü dai**, Ankaralı **Dehri**, Sivrihisarlı **Deruni**, Erzurumlu **Devrani**, Kayserili **Efşâni**, Hasköylü **Endâmi**, İstanbullu **Eremya Çelebi**, Kayserili **Fakiri**, Amasyalı **Güftari**, Salmastlı **Gul Arutin**, Bahçecikli **Hacioğlu**, Tiflisli **Harbi**, Bayburtlu **İkrari**, Erzurumlu **İkrari**, Kayserili **İlmi**, Kayserili **İzani**, Diyarbakırlı **Kahti**, Amasyalı **Kalusd Gayzag**, Kavkaslı **Ğara**, Vanlı **Koçag**, Harputlu **Lengi**, Kayserili **Lisani**, Erzinanlı **Lisani**, Kafkaslı **Lisani**, Kayserili **Lutfi**, Karslı **Lutfi**, Kayserili **Mahcubi**, Kayserili (Büyük) **Mahcubi**, Tiflisli (Küçük) **Mahcubi**, Kayserili **Maklubi**, Kayserili **Mevzuni**, Kayserili **Meydani**, Çemişgezekli **Mihri**, Kayserili **Minneti**, Kayserili **Nadiri**, Yozgatlı **Nasibi**, İstanbul Patriği **Nihadi**, Kafkaslı **Panki**, Kafkaslı **Patal**, Maraşlı **Perişan**, Sivaslı **Pesendi** (Mardiros), Sivaslı **Pesendi** (Hacı Deniyel), Balıkesirli **Piryani**, Tokatlı **Safi**, Tiflisli **Sayat Nova**, Bahçecikli **Sebil**, Bursalı **Serveri**, Everekli **Seyrani**, Bahçecikli **Simon Ağpar**, Kayserili **Talibi**, Eğinli **Tengi**, İstanbullu **Tifli**, Arapgirli **Turabdar**, Kayseri/Talaslı **Turabi**, Karslı **Tüccari**, Erzurumlu **Zalalat**, Tokatlı **Zayifi**, Kayserili **Sarkis Zeki** (Nurlıyan), Tokatlı **Zevki**, Kayserili **Ziyneti**, Asitaneli (İstanbul) **Zulali** (21)

Burada, sadece çalışmanın indeks bölümünde memleketleri belirtilmiş olanları sıraladık. Yoksa bugün elimizdeki isim listesi çok daha geniştir. Gerek buradaki liste gerekse ayrıca belirlediğimiz döküm, İstanbul'dan sonra Kayseri- Maraş- Sivas hattının en yoğun bölge olduğunu gösteriyor.

Sözgelimi burada verilen isimlerden **Everekli** yani Kayseri/ Develili **Seyrani**'nin Ermeni kökeni yeterince bilinmemekte veya bilerek verilmemektedir. Oysa, Kayse-

ri'ye bağlı Everek/ Develi kazası, geçmişte Ermeni yoğunluklu bir beldedir ve özellikle taş işçiliği Ermeni ustalar yoluyla bölgede ün salmıştır.

Yine, Sivas bölgesinde yetişmiş ünlü halk ozanı **Âık Veysel**'in de Ermeni kökenli olduğuna dair bilgiler vardır. Daha TRT'de çalıştığım yıllarda, Kırşehir/Mucur'lu spiker arkadaşım **Ersin İmer**, kendilerinin **Aşık Veysel**'le akraba olduklarını ve Ermeni kökenli olabileceklerini belirtmişti. Günümüzün Serhad bölgesi denbêjlerinden **Ozan Şemdîn**, Ermenistan televizyonunda görüp tanıştığı bir çalışanın, **Aşık Veysel**'in akrabası ve Ermeni olduklarını söylediğini aktarmıştı.

Sonuç

Arşivimizde, bu hüznü yolculuğu sürdürmeye elverişli çok daha fazla materyal var. Ancak, konuyu daha fazla uzatmamak için sadece birkaç küçük anekdot aktarmakla yetinelim. Bunlardan birisi Kayseri'den. Kayseri'nin Muncusun köyünde doğan **Asadur Sarafyan**, ailesinin daha 1895'te Abdülhamid katliamından kurtulmak için nasıl mağarada saklandığını ve sonradan Amerika'ya geçtiğini yani Ermeniler açısından bildik bir hikâyeyi anlatıyor. (22)

Bir başka anekdot da, yüzyılın birçok trajedisine tanıklık eden Maraş Zeytin'lu, sonraların ünlü Ermeni tiyatrocusu **Nazarat Peşdikyan**'a ait. Katliam başladığında, o her şeyden habersiz 6 yaşında bir çocuktur. Babası ve annesi öldürüldüğü için yetim kalan Peşdikyan, Osmanlı askerlerinin onları nasıl toplayıp kızgın çöllere sürdüklerini, aç- susuz bıraktıklarını ve kırbaçladıklarını hiç unutmuyor. *"Bugün gibi hatırlıyorum. Çocuktum, korkuyordum. Cesetlerin üzerinde yürüyordum. Halep yakınlarında herkesi soyup çölde terkettiler. Bize, hepiniz soyunun dediler. Ben şortla kaldım. Birçok kadına tecavüz ettiler. Birçok insanı öldürdüler. Ce-*

hennem gibiydi her yer. Ölülerin üzerinde yürüyordum. Bizi öylece çölün ortasında terk ettiler. Kimsenin ölüleri gömecek takati bile yoktu. Cesetleri hayvan leşi gibi ortalıkta çürümeye terk ettik..” (23)

Ve kulaklara küpe olacak tarzda bir ders veriyor: **“Katliamları ve savaşları unutmamalıyız. Tarihın tekerrür etmemesi için ibret almalıyız... Bir daha yaşanmasının diye unutmamalıyız...”** (24)

K a y n a k l a r

- 1- Prof. Dr. Vahakn Dadrian: **Osmanlı Türkiyesi’nde Ermeniler**, Öz-Po, 10.6.2005
- 2- Bkz. **“Nor Anadolu”** belgeseli dolayısıyla Burak Peksezer’le Konuşma, Radikal, 25.7.2011
- 3- Bkz. NTV Tarih, Sayı:46/ 2012; Yeni NTV Tarih, Sayı:11/ 2015
- 4- Agos, 7 Aralık 2012
- 5- Öz-Po, 18.2.2010; Cumhuriyet, 11.4.2010; Taraf gaz. 16.8.2012
- 6- Sözelimi bkz. Gökçe Günel: **Amasya Evleri**; Kültür Dergisi, Sayı:102/1993
- 7- Öz-Po, 25.8.2016
- 8- Cumhuriyet gaz. 28.8.2016
- 9- Özgür Çağlar: **Bu Defa Ölenler Değil, Kalanlar Konuşacak**; Agos, 4.10.2013
- 10- Ursula Reinhard- Tiage de Oliveria Pinto: **Sanger und Poeten mit der Laute (Türkische Âşık undu Ozan)**, Berlin- 1989

11- 2 Ciltlik bu kitaba ilişkin, Editör Ali Çakmak’la yapılmış ayrıntılı bir görüşme için bkz. Jaklin Çelik: **1878’in Ermenileri**, Radikal İki, 11.7.2010

12- V. Engin: **Amerikan Rüyası Görüp Yola Çıkan Osmanlı Vatandaşları Yolda Kaldılar**; Hürriyet Tarih, 17.9.2003

13- Serdar Eroğlu: Çemişgezek’ten Los Angeles’a, Öz-Po, 20.12.2011

14- Ali Ongan: **Bir Ermeni Babanın Kürdistan Notları/ Hoşçakal Mezopotamya ve Sahipleri**, Öz-Po, 4.9.2000

15- Semra Çelik: **Egemenlerin İnadına Barış Kazanmalı**; Evrensel, 7.4.2008

16- Bkz. Agos gaz. 14.6.2013

17- **“Şimdi De Hemşin’de Ermeni Kültürü Yok Ediliyor”**, Öz-Po, 7.9.1998

18- Serdar Korucu: Agos gaz. 24.7.3013

19- Fatih Gökhan Diler: Agos gaz. 16.5.2014

20- Mert İnan: **Azınlık Okulları Nereden Nereye**, Vatan, 20.9.2013

21- Özel Arşiv (T. Azadyan Yazmaları)

22- Vahan Altıparmak: **Bir Kehanet Gerçek Oldu**, Agos, 27.7. 2007

23- Murat Aktaş: **Ermeniler “Sözde” Ölmedi**, Öz-Po, 25.4.2003

24- “ “ : **Bir Daha Yaşanmasının Diye Unutmamalıyız**; Özgür Gündem, 25.4.2003

Dengên kurdî yên ku bê nasname mane



Nasir KEMALOĞLU

Zimanê me zimanekî dewlemend e. Hetanê çend salan berê, di qadên fermî û nivîsandinê de nehatîye bikaranîn lê miqabil li ser xwe sekinîye û zindî maye. Pêşîyên me di nav zordarî û qedexekirinê de ji me re zimanek dewlemend, paqij û zelal wek pêymayîyek zêrrîn hiştine. Bi hemû deng û awazên xweyên taybet Kurdî di saya serê mezinên me de li ser lingên xwe maye. Lê belê îro bi gotin û nivîsên kesane û ji realîten zanyarî dûr hinek dengên zimanên me hatine windakirin. Wek her sê alfabeyên ku rojane di zimanê me de tên bikaranîn di dîrokê de kîjan alfabe dibe bila bibe qîma dengên zimanê me nekirîye û li van alfabeyan ji bo dengên me tîp hatine zêdekirin. Di alfabeya me ya Latînî de jî hinek dengên me bê tîp mane û bi taybetî di karanînên " ç k p t " yê de pîrsgirêk û gengeşî berdewam dike.

Fêrbûna zimanê qisedanê bi qisedan û lorîyên dayîkan; fêrbûna zimanê nivîsê jî bi hînbûna alfabeyê dest pê dike. Zimanê nivîsê bi nîşanên dengan tê bikaranîn û meriv dikare bibêje bingeha zimanê nivîsê

nîşanên dengan ango tîp in. Dengên ku ji devê merivan derdikeve **bi îşaretên taybet** di alfabê de tên dîyarkirin û nivîsandin. Wextê alfabe tê binavkirin meriv dikare " **koma îşaretên dengên ku di nav zimanekî de tên bikaranîn** " bibêje. Di zimanan de deng bi îşaretan tên dîyarkirin. Eger deng bê îşaret mabin, kêmasî di sîstema fonetîkê de derdikeve holê û bi taybetî di xwendin û nivîsê de şaşî çê dibe. Bi gelemperî her **deng** bi îşaretek tê dîyarkirin. Lê belê di hinek zimanan de carna dengêk bi çend îşaretan (tîpan) tê nîşandan. Wek mînak; di zimanê me de dengê ku bi " ş " yê diyar dibe ; di zimanê Fransî de " ch ", di Îngîlîzî de " sh " û di Almanî de jî " sch " tê dîyarkirin. Di zimanê me de dengê ku bi " o " yê tê nîşankirin, di zimanê Fransî de bi gorî çar rengên xwe yên fonetîkê bi " o, ô, au, eau " tê nîşankirin. Dîsa di zimanê me de dengê ku bi " k " yê tê nîşankirin di zimanê Fransî de rengêrêng bi sê tîpan " c, k, q " tê nîşankirin. (**G. Mauger, 1995**).

Ji bo hemû rengên dengên xwe yên tay-

bet netewan çareserî ji sîstema fonetîka zimanên xwe re dîtine. Kurdên me yên Başûr bi gelemperî bi alfabeya Erebi dinivîsîn. Li alfabeya Erebi, ji bo dengên Soranî yên cuda, hinek tîp " Ç, G, J, P, V " hatine zêdekirin. (**Amêdî, Sadiq Behadîn. 1982**). Her wiha di warê zanistîyê û wêjeyê de gellek pirtûk bi vî alfabeyê hatine çapkirin. Osmanîyan alfabeya Erebi bikaranîne lê belê ji ber ku qîma dengên Tirkî nekirîye li vî alfabeyê hinek tîp (hemze ء, pe پ, çim چ, je ج, gef گ û nef ك) zêde kirine. Her wiha bi vî awayî alfabeya Erebi li zimanê xwe anîne (**KAYA ERBATUR, Vildan ve DEMİR, Ercan 2012**). Ango zimanê xwe li qalibê alfabeya Erebi nexistine.

Kêmbûna tîpên alfabeyan ji dengên zimanan re nabin pirsgrêk. Meriv wextê di dîrokê de li alfabeyan mêze dike bi gelemperî bi gorî dengên tîp kêmbin jî hemû dengên zimanan (ji sedî sed jî nebe) hatine dîyarkirin. Wek meriv di alfabeyên rojane yên hinek netewan (Almanî, Fransî, Îngîlîzî...) de dibîne, alfabeyên kevn de jî pirsgrêka kêmasîya dengên hebûye. Wek mînak meriv dikare alfabeya Pehlewî bide. Alfabeya Pehlewî bi 12 tîpan saz bûye lê belê Kurdan bi vî alfabeyê 24 deng bikaranîne. Dîsa li Alfabeya Mixî ya ku bi 36 tîpan saz bûye, Kurdan 6 tîp lê zêde kirine (**ÇELİKER Celadet, 2012**) û bi vî alfabê hemû dengên xweyên taybet re çareserî dîtine. Bi vî awayî **alfabe li zimanê xwe anîne lê miqabil zimanê xwe li alfabeyan neanîne.**

Fonetîka zimanê Kurdî ya rojane ji versiyonên dengên tîpên Erebi " **eyn- ع** , **hê- ح** û **xeyn- غ** " ê û ji " **l û r** " ji yên lertzokî der bi 36 dengên dibe. Eger dengên ku ji Erebi û Farisî derbasê zimanê me bûne û dengên lertzokî bên hesibandîn, 47 deng di zimanê Kurdî (taybetî zaravaya Kurmancî) de tên bikaranîn. Lê belê ji ber ku bendor zimanan li ser hev he ye dengên zimanan

jî li nav hev ketine. Ev rewşa hanê bi tenê di zimanê Kurdî de tune ye. Ango hinek dengên taybet yên zimanên Erebi û Farisî di zimanê Fransî de wextê tên bikaranîn ji rêzik û qeydeyên alfabeyê der ji wan re bi tîpek û bi çend tîpan çareserî hatiye dîtîn. Wek mînak : Dengên ku di zimanê me de û hinek zimanên Rojhilata Navîn de bi tîpên " **c, ç, û x** " yê tên nîşandan di zimanê Fransî de tune ne û di sazûmana fonetîka ziman de jî nehatine dîyarkirin. Lê belê ji wan re çareserî wiha hatiye dîtîn : Dengên " **c, ç, x** " yê di zimanê Fransî de bi " **dj, tch, kh** " yê tên nivîsandin. Hoca—Hodja, Çeçen—Tchéchéne û Xumeynî—Khomeini.

Di zimanê Erebi de ji bona dengên nezikê hevdu tîpên cuda hatinê dîyarkirin. Dengên ku di zimanê me de bi tîpên " **d, s, t, z** " yê hatine dîyarkirin ji ber ku fonetîkên wan cuda ne (rengên dengên wan nêzikê hev bin jî) di Erebi de her rengedengek bi tîpek hatiye nivîsandin û dîyarkirin.

D- ض د
T- ط ت

S- س ث
Z- ظ ز

Wer tê dîtîn ku Ereban dengê xwe kêma nekirine û wek me " **ev deng nêzikê hevîn û her wiha bi tîpek em dîyar bikin, di xwendinê de kîjan tîp ji bo kîjan dengê be ji hev tê derxistin** " ne gotine. Meriv dikare mînak bi muqayese kirina zimanê Fransî jî zêde bike. Em dengên ku bi tîpên " **a, e, f, j, o, s, z** " yê didin dîyarkirin, di Fransî de (bi gorî bêjeyan de tên bikaranînên), ji yekî zêdetir tîpan hatine dîyarkirin.

A- a, à
F- f, ph
eau

E- e, é, è, ê, ai
J- g, j
S- c, s, ss

O- o, ô, au,
Z- s, z

Alfabeya Fransî bi 26 tîpan (**morfem**) hatiye sazîkirin; lê miqabil **37 deng (fonem)** di zimanê Fransî de hene. (**G. Mauger,**

1995) Çima gelo bi tîpekî hinek deng na-hatine dîyarkirin û deng û rengên dangan cûda cûda bi komtîpan hatine dîyarkirin? Gorî dengên zimanê Fransî kêmasîya **tîpan** tu pîrsgirêk ji **dengan** re çê nekirîye û bi van tîpan çî deng hebin hatine dîyarkirin. **Di alfabeyê de cî negirtibin jî** tîpên bideng li ser wan îşaret hatine danîn " **à, â, é, è, ê, î, ò, û** " û bi vî awayî jî reng û fonetîkên tîpên bideng hatine zêdekirin û hinek deng jî bi du tîpan (û zêdetir) hatine dîyarkirin. Gelo em jî nikarin wisa bikin? Li ber û li ser hinek tîpan nîşanek taybet bikarbînin û ji dengên ku bê tîp mane re bi vî awayî çareserîyê bibînin! Gelo, ewê çawa bibe?

Ji bo çareserîyên dîyarkirina dangan sîstema fonetîka zimanê Fransî mînakê balkêş e. Di kurte tabloya dengên bîngêhîn ya sazûmana fonetîka zimanê Fransî de hemû dengên (37 deng) ku di zimanê Fransî de hene bi alîkarîya tîpên alfabeya Fransî (bi 26 tîpan) hatine dîyarkirin.

Di alfabeya me ya rojane de dengên ku bi tîpên " **ç k p t** " yê hatine nîşandan bi du rengan tîpên bikaranîn. Lê miqabil ji van rengên dangan re tîp nehatine dîyarkirin. Dengên ku bê tîp mane wek rengên dangan hatine dîtîn û ji wan re tu çareserîyek pêk nehatîye. Gelo alfabeyek fonetîk li Kurdî tê ? Ji bo kîjan rêzik û qeydeyan " **Kurdî zimanek fonetîk e** " hatîye gotin ? Bidemane hinek lêkolînerên zimanê Kurdî vê pîrsgireka hanê ango kêmasîya dangan anîbin ziman û cûda cûda pêşnîyarên xwe diyar kiribin jî, ji ber ku " **tîpên alfabeya Kurdî zêde dibin** " bi gelemperî kesî guh nedaye van pêşnîyaran.

Meriv dikare bi tîpên alfabeya me ya rojane dengên ku ji alfabeyê der mane re ji nû ve nîşan û îşaretan dîyar bike. Eger hevce be bi du tîpan û ji du tîpan zêdetir van dengên hanê, wek zimanê di famîlya zimanê me de

cî girtine (Fransî, Îngîlîzî û Almanî), bide nîşandan. Ji xwe di zimanê me de bi du tîpan (**x û w**) dîftongek " **xw** " hatîye dîyarkirin û hebûna dîftongê , bi tîpên zêde, **heqê** çareserîya van dangan, dide me.

Ferhengên Kurdî de bêjeyên bi tîpên ku tê de pîrsgirêkên rengedengîyê hene û bi dengên zimanên bîyanî tîpên bilêvkirin yekoyek werin vekolandin û dahûrandin meriv encamek wiha bidest dixê : Bêjeyên bi " **ç k p t** " yê nerm destpêdikin bi misogerî bêjeyên Kurdî ne. Lê belê yê ku bi rengedengên " **h, x** " yê destpêdikin bi piranî bêjeyên ku ji zimanên din derbasê zimanê me bûne. Dîsa bêjeyên ku bi tîpên bideng destpêdikin (û di kîtêyên wan de tîpên bideng hene) di binê bandora fonetîka tîpa Erebî " **eyn- ع** " ê de mane jî " **jêderk** " ên wan yan Erebî yan jî Farisî ne. Ev deng ji alîyê zimannasên Kurdî ve wek dengên cûda nahatîye nirxandin. Bêjeyên ku fonetîka wan di bin bandora " **eyn- ع** " ê de mane bi fonetîka Kurdî werin bilêvkirin jî wateyên wan nayên guhertin. Meriv wek fonetîka jêderkên wan û wek fonetîka zimanê me bilêv bike, tu pîrsgirêk di wateyên wan de dernakeve holê.

Pîrsgirêka bikaranîna van dangan (yê ku di bin bandora dengên " **eyn- ع, hê- ح** û xeyn - **خ** " ê de mane) pêwîste bê şîrovekirin! Ji ber vê yekê bêjeyên ku bi van deng û tîpan destpêdikin û yê ku tê de " **l, r** " yê bişid hene, di nava 16813 bêjeyan de hatin hîlbijartin. Her wiha bi alîkarîya çavkanî (**Zana Farqînî, 1992; D. Îzolî, 2007; KEMALOĞLU, Nasır, 2017 û www.ferheng.org**) û bêjeyên ku hatine hîlbijartine de , rêjeya hemû dengên ku li ser wan gengeşî berdewam dike (xênjî deng û tîpên " **ç k p t** " yê) û yê ku ji zimanên bîyanî derbasê zimanê me bûne, wek tabloya jêrîn tîpên şîrovekirin.

Tabloya dengên ku ji zimanên biyanî derbasê zimanê me bûne û yên ku bişid tên gotin
(Tablo 2)

Tîp û Deng	Jimara bêjeyên ku bi van dengên û tîpan destpêdî-kin (kêş û zêde)	Mînakên bêjeyên ku di bin bandora Erebi û Farisî de mane û yên lerzokî (Despêk û di nav bêjeyan de)	Jimara bêjeyên ku tê de dengên bê tîp he ne	Rêjeya bêjeyên ku tê de dengên bê tîp he ne
a [a]	751	Abid, aceb, aciz, adet, adil, Adûl, af, aferîn, alarm , alem, alewî, alî, alîm, amel, amele, amelîyat, amîr, anane, ar, arûz, ayar , azêrî, azîl, azîz, çal , çalav , çamur , çav ... (bêjeyên ku fonetîka wan di bin bandora " eyn-ع " ê de mane û yên ku Erebi û Farisî ne)	28	% 3,7
e [ε]	457	Ebûbekir, ecayîp, eceba, ecep, ecel, ecem, eciz, edilandin, efû, egît, elamet, elb, eleqe, emir, enî , enîşk, entîn, epî, erd, erebe, erebî, erş, erz, esl, esir, eşîr, etarî, evd, Evdî, evdal, ewr , eyar , eydî, Eynê, eynik, ezab, ezeb, ezîm, ezîz, ezman... (bêjeyên ku fonetîka wan di bin bandora " eyn-ع " ê de mane û yên ku Erebi û Farisî ne)	40	% 8,7
h [h]	811	Hadîs, hadîse, hafîye, hafîz , hakem, hakim, hal, hanefî, harişî, hazir, heb, hecinandin , hecî, hedad, heft , hejandin , hejdeh , hekem, hekîm, helal, helandin, helaw, helîme, hemal, hemam, helîse, hemêz, hemd, hemîşe, hene, henefî, heram, Heran, herb, herem, herf, herîşî , hesab, hesandin , hesar, Hesên, hesret, hesûd, heşt , heta, hevdeh, hewes, heyderî, heyf, heyran , heyranok , heyret, heywan, hez, hezar, hezîn, hezîran , hezret, Hez-ro , hecîz, hêç, hidûd, hikim, hirehir , hirmet, his, hiş, hişk, hîcret, hîkaye, hîle, hîzîp, holik , hukim, hulhulî , hurîyet, hurmet, Husên, hutik , hût... (bêjeyên ku fonetîka wan wek deng û tîpa Erebi " hê- ح " yê tê bilêvkirin)	80	% 9,8
î [u]	118	Îlm, intandin, intîn, irq, irs, izdirab, isyan, îşkî (bêjeyên ku fonetîka wan di bin bandora " eyn-ع " ê de mane û yên ku Erebi û Farisî ne)	8	% 6,7

î [i]	201	Îlîm, îllet, îlmî, îlmûxeber, îrfan, îzzet, îzzetînefis (bêjeyên ku fonetîka wan di bin bandora " eyn-ê " ê de mane û yên ku Erebi û Farisî ne)	7	% 3,5
l [l] û ll [lʳ]	364	Billûr, billor, cellad, çille, çillek, dêllik, fellah, fille, gellek, gollik, gulle, hillû, hollik, kelle, killor, kullek, kullik, lîlik, melle, millik, pellik, qallik, qullik, sellik, sillek, şillek, şillî, tellik, telliqîn, tûlle, welle, xillik, zillût... • Hemû bêjeyên ku bi tîpa " l " yê destpêdikin bi şîd " ll [lʳ] " tên bilêvkin.	33	% 9
o [o]	95	Orandin, oreor, orîn(bêjeyên ku fonetîka wan di bin bandora " eyn-ê " ê de mane û yên ku Erebi û Farisî ne)	3	% 3,1
r [r] û rr [rʳ]	693	Birr, birrî, birrîn, çirr, çirreçirr, çirrîn, firr, gerr, gêrr, gêrran, girregirr, girrêz, gorr, gurr, gurçîk, gurrîn, gurrr, kurrîn, merr, pirr, şirreçirr, şirrik, şirrîn, terr, terrî, zêrr, zêrrîn, zirr, zirrîn, zûrr, zûrrîn... • Hemû bêjeyên ku bi tîpa " r " yê destpêdikin bi şîd " rr [rʳ] " tên bilêvkin.	31	% 4,5
u [œ]	21	Umre, umûmî, urtin, uryan, uzr (bêjeyên ku fonetîka wan di bin bandora " eyn-ê " ê de mane û yên ku Erebi û Farisî ne)	5	% 23
û [u]	39	Ûc, ûrîn (bêjeyên ku fonetîka wan di bin bandora " eyn-ê " ê de mane û yên ku Erebi û Farisî ne)	2	% 5,1
x [x]	637	Xafil, xalib, xalîb, xalîba, xalîbîyet, xar, xaret, xaye, xayet, xazî, xazîtî, xeddar, xefar, xefûr, xemze, xenîm, xerb, xerbî, Xerbîya, xerîb, xeyb, xurbet, axa, boxe, dax, max, mixare, şax, poxan, yaxnî ...	30	% 4,7

Hemû bêjeyên ku bi tîpên **bideng** (yên ku di bin bandora deng û tîpa Erebi « **eyn-ê** » ê de mane) destpêdikin û bi tîp û dengên tê de gengeşî û tevlihevî hene li jorîn hatine nivîsandin. Di tabloyê de bi gelemperî bêjeyên xwerû bi tenê wek mînakên bîngêhîn û balkêş hatine dîyarkirin û ji ber ku jêderkên wan hatine nimandin yên pêkhatî û hevedudanî nehatine nivî-

sandin. Di ferhengê zimanê Tirkî (**Türkçe Sözlük, 1988**) û di ferhengên zimanê Kurdî de hemû bêjeyên li bin tîpên « a, ç, e, h, i, î, k, p, o, t, u, û, x » yê he ne hatine vekolandin. Her wiha bêjeyên di zimanê Kurdî de tên bikaranîn him ji bernivîsên wan (ji kîjan zimanê hatibin) him jî bi alîkarîya grûbek seydayên ku baş Erebi dizanin hatine şîrovekirin. Wer xûya dike ku di

Kurdî de xênjî rengdengên « ç k p t » yê û bikaranîna « l û r » yê ku bi şid tên bilêvkirin, meriv dikare bibêje di dengên hinek bêjeyên ku bi tîpên bideng (û di kîteyên wan de bidengên ku di bin bandora « eyn-ع » ê de mane) û bi « h û x » yê destpêdikin de jî pirsgirêk û gengeşî hey e û berdewam dike.. Wek gellek zimanan di Kurdî de jî bêjeyên bi « a û e » yê destpêdikin bi gori bidengên dinê zêde ne û nav van bêjeyan de hinek bêjeyên ku ji Erebî û Farisî derbasê zimanê me bûne he ne. Di axaftinên rojane de gellek dengên Erebî û Farisî di zimanê me de tên bikaranîn. Senifandina ferhengên de tê dîtîn ku di nav bêjeyên ku bi tîpên bideng destpêkirî (**xênjî ê'** yê « a, e, i, î, o, u, û ») de yên Erebî û Farisî he ne. Lê ev bêje jî qasê ku meriv **gorî fonetîkên wan** tîpên nû bidê zêde nîn in. Ji bo van dengên pêwist nîn e ku meriv nîşanên nû bide

û tîpên alfabeyê zêde bike. **Wek fonetîka zimanê me** bên xwendin jî wateyên xwe dûr nakevin û wateyên wan winda nabin. Meriv dikare van bêjeyan wek “**awarte**” bi pejirîne. Dîsa hinek bêjeyên ku bi « h û x » yê destpêdikin û di kîteyên wan de ev tîp he ne, ji Erebî û Farisî derbasê Kurdî bûne. Ji ber ku di bin bandora dengên « hê- ح û xeyn - ع » ê de mane, bi taybetmendîya sîstema fonetîka Erebî û Farisî tên bilêvkirin. Bi gelemperî ev bêjeyên ku destpêk û kîteyên wan bi van dengên tên bilêvkirin, ji van herdu zimanan û ji zimanên dinê derbasê zimanê me bûne. Hewcedarîya bi tîpek dinê diyarkirin û guherandina van dengên (**h û x**) jî tune ye. Meriv dikare wek xweyî bihêle. Dengên ku di bin bandora Erebî û Farisî de mane û yên ku ji van zimanan hatine bi alîkarîya tabloya jêrîn wiha tên şîrove kirin.

Tabloya mînakên dengên ku ji Erebî û Farisî derbasê zimanê me bûne

(Tablo 3)

Tîp	Mînakên ji bo Dengên Kurdî		Mînakên ji bo Dengên Biyanî	
a	Av û ard	Ava me şêlû tê. Ard hêra û hat malê.	Ar û alim (wek fonetîka tîpa Erebî " eyn-ع " ê ð)	Ara rûyê xwe min got erê! Alimekî hêja bû.
e	Ez û evîn	Ez û tu bi hev re diçin. Evîna te ji dilê min dernakeve!	Esil û erd (wek fonetîka tîpa Erebî " eyn-ع " ê ð)	Esil winda nabe! Min li ezman dixwest Xwedê li erdê da.
i	Îrq û îrsîyet	Îrqa te çîye? Îrsîyet li merivan kar tê.	Întîn û ilm (wek fonetîka tîpa Erebî " eyn-ع " ê ð)	Întîna te heta sibê berdewam kir. Melayê donzde ilm bû.
î	Îlon û îrade	Meha îlonê ezê bêm ba te. Îradeya me ji destên me girtine!	Îsa û înad (wek fonetîka tîpa Erebî " eyn-ع " ê ð)	Hezretî Îsa li çar-mixê xistin. Înad jî wek miraz e.

o	Ol û orte	Ola te çi ye? Orta te û min xirabe.	Orîn (wek fonetîka tîpa Erebi " eyn-ع " ê)	Orîna çêlekê ye!Golika xwe digere.
u	Gul û gur	Gur hat nava pez. Tu gula min î.	Urtîn û uryan (wek fonetîka tîpa Erebi " eyn-ع " ê)	Bişev urtîna te bû. Ji ber depremê uryan terketibû der.
û	Ûr û kûr	Ûr di serê min de derketîye. Nekeve cîyê kûr !	Ûc û ûrîn (wek fonetîka tîpa Erebi " eyn-ع " ê)	Wek ûcekî dixwar. Ûrîn û zûrîna wî bû.
h	Hêlîn û hesin	Hêlîna bilbil xirab kir. Hesin zeng digire, ax jî wek xwe dimîne.	Hekîm û helandin (wek fonetîka tîpa Erebi " hê-ح " yê)	Hekîmo ! Melhemê li birîna min bide! Diya min îro rûn di helîne .
x	Xal û xirbe	Xalê min hat mala me. Mal li min bû wek xirbe !	Mixare û axa (wek fonetîka tîpa Erebi " xeyn-خ " ê)	Mixareya Hopikî de birek pez cî dibû. Belê axayê min!

Di encama şîrovekirina van dengên de xêr- jî dengên ku em îro, çi hişk û çi nerm, bi " ç, k, p, t " yê diyardikin, tu dengê de pîrsgirêka diyardikîne tune ye. Hemû dengên dinê ji ber ku em bi hev re jîyane û cînarên hev bûne ji Erebi û Farisî derbasê zimanê me bûne. Hinek bêjeyên ku bi tîpên bideng " a, e, i, î, o, u, û " yê destpêkirine û sazûne, di binê bandora deng û tîpa Erebi " eyn ع " ê de mane û yên ku bi fonetîka " hê- ح " û " xeyn-خ " ê tîpên bilêvkin wek taybetmendîya fonetîka zimanê me bîlêvkin û xwendin, tu pîrsgirêk di gotin û wateyê de çê nabe.

Bikaranîn û bilêvkirina " l û r " yê jî, eger " l û r " di destpêkên bêjeyan de bin, jixwe bişid û bilerz tîpên bilêvkin. Her wiha di hinek kîteyên bêjeyan de bişid û bilerz bîlêvkin divê bi " ll û rr " yê werin

nivîsandin. Hewcedarîya bi nîşanek dinê diyardikin tune ye. Ji ber ku şidkirin û lerz- kirin bi dubarekirina tîpan tîpên bilêvkin di sîstema fonetîkê de diyardikîna van dengên hevce û **pêwîst** nîn e.

Lê belê bilêvkirina dengên ku îro bi " ç, k, p, t " yê tîpên diyardikin, wekxweyî nebe û ji van re bi rêzîkên fonetîkê tîpên neyên diyardikin, di nivîs û xwendinê wan de şaşî çê dibin. Wek mînak em " çil " ê ku bi wateya yekê çavên vî li destên hinekan be û çavên wî tîr nebe û " çil " ê ku bi wateya jimara li pê sîh û nehan tî çawa ji hev derxin? Ka em çawa bizanibin " çil " ji bo kîjan wateyê hatîye bikaranîn ? Di gotina " Ez îro rastê **merivêkî ker hatim** " de eger me ji her du dengên ku bi " k "

yê dîyar dîkin re cuda cuda tîp û îşaret nedîtibe, pîrsgîrêk di wateya rengdêra "ker" ê de derdikeve holê. Gelo "ker" **bi wateya** merivekî "guhdirêj, çarsim" û çarpê (heywan) "û bi wateya" merivekî **deng naçê** "hatîye bikaranîn? Meriv nizanê. Di hevoka "Apê min **karek** dabû min" de gelo bêjeya "karek" bi wateya "îş û şixul" an bi wateya "piçûka bizinê" ye? Meriv nizanê! Her wiha di watedarîya bêjeya "karek" de û di watedarîya hevokê de diwarî çê dibe.

Dibêjin ku di herikandina xwendinê de meriv dizane bi çî wateyê hatîye bikaranîn û bi wî awayî jî meriv bi gorî fonetîka van herdu bêjeyan dixwîne! Gorî van gotindara **gelo xwendin bi zanîna wateya bêjeyan çê dibe?** Ma, nivîs û xwendin bi îşaret (tîp-grafem) û dangan (fonem) çê nabe? Di navbera van herdu termên rêzimanê de (grafem û foneman de) divê aheng û zelalbûn hebe. Wextê tîp û deng zelal nehatibin dîyarkirin û hevdu negirin xwendin û nivîsek zelal jî dernakeve holê.

Li ser vê mijarê çî hatîye gotin?

Osman Sebrî di kovara "Hêvî" yê de di nivîsa xweya bi navê "Elîfbê ya Kurdî" de ji civînek ku ji aliyê Celadet Bedirxan çê bûye behs dike (ji bo nîqaşkirina alfabeya Kurdî) û wiha dibêje: "Piştî em bi ser û ber li elîfbêya pêkhatî hûr bûn, Celadet ji me pîrsî û got: Ma hûn tişteki kêmanî di vê elîfbêyê da dibînin? Kesekî ji hevalên di civînê da deng nekir. Hînga min gotê: Erê ez tê da çar tîpan kêmanî dibînim ku di zaravayê kurmançî da hene. Divê em çavên xwe li ser tinebûna wan tîpan negirin. Tinebûna wan di elîfbêya me da kêmanîyeke berbi çav e." û kêmasîya "ç, k, p, t" yê nerm anîye ziman. Celadet Bedirxan dibêje: "Rast e ev herçar tîp di zaravayê kurmançî da hene. Lê em dikarin ji tîpên nîzîkî wan

(ç p k t) destkewtî bibin, herwekî me bi tîpên erebî dinivîsandin. Va ye hemî elîfbêyên Awropî di navbera 29-31 tîpan da ne. Eve elîfbêya me bûn 33 tîp". Paşê Osman Sebrî lê vedigerîne û dibêje: "**Hêja ye em ji wek Awropîyan bi pêşkevin, lê ne bi kêmkirina tîpên elîfbê**" (Hêvî, Hejmara 1, 1983). Di vî nivîsê de, tîne ziman ku gotina wî ji aliyê beşdarên civînê û ji aliyê Celadet Bedirxan ve nehatîye qebûlkirin. Celadet Bedirxan kêmasîya van dangan pejiwandibe jî di alfabeya xwe de **ji ber ku tîpên alfabeyê zêde nebin** îşaret nedaye van dangan.

Nureddin Zaza jî, dîsa di "Hêvî" yê de di nivîsa xweya "**Çend Gotin li Ser Zimanê Kurdî**" de hîs û ramanên xwe tîne ziman û di encama nivîsê de dibêje "Rehmetî mîr Celadet dizanî ku di zimanê kurdî de (kurmançî û zaravayên din) bêtirî 32 deng hene, wek: 2 h, 2 k, 2 l, 2 r, û hin din. Ewî welê didît ku di xwendinê de, peyayên ku di dibistanan de hînî kurdî bibin ewê bikaribin van dangan ji hev derêxin. Ji lewre, ewî nedixwest ku elfabe ya kurdî girantir bike. Ez bi xwe, pejnên wî rast dibînim. Lê ez wan nakime **Mishefa Reş**, ne jî **Qoran**. Heke, sibe yê kurdî didine xwendin (mamoste) û yê kurdî dixwînin bibînin ku **bi vê erebeya ha rêveçûn nabe**, ewê bivê, nevê li guhartina wê bigerin" (Hêvî, Hejmara 1, 1983). **Nureddin Zaza** bi vî gotina xwe rêya "nûkirin û perisandin" a alfabeya Celadet Bedirxan vekirîye.

Kovara "Hêvî" yê di nivîsa "Pîrsên Alfabeya Kurdî" de bi gelemperî pêwîstîya dîyarkirina dengên ku di alfabeya Celadet Alî Bedirxan de nehatîye nîşankirin anîye ziman û bi mînakên taybetî li binê sernivîsa "**Kêmasîyên Alfabeya Hawarê**" de pîrsgîrêk hatîye şîrovekirin. Her wiha him pîrsgîrêka "ç, k, p, t" yê û ya "r û l" yê bi mînakên balkêş şîrove bûye

him jî " **Bi kurtî, alfabeya Hawarê bê kemasî nîne lê dikare, bê guherandin, bersiva nivîsandina zaravayê kurmancî bide.** " hatîye gotin (**Hêvî, Hejmar 1, 1983**). Dijî vî gotinê meriv dikare bibêje eger " **pirsgirêk û kêmasî** " hebe divê em li çareserîyê bigerin. Ji **tunebûnê** alfabeya me ya rojane saz bûye û îro em li ser **he-bûna** vî alfabeyê dikarin pirsgirêka hanê çareser bikin.

Di zanîngeha Rouenê (Fransa) de akademîsyen û zimannas **Salih Akin** di nivîsa xweya bi navê " **Alfabeya Kurdî ya ku li Tîpên Latînî Hatîye Adaptekirin** " ê de pêvajoya alfabeyên Kurdî dinirxîne û îro di her qadê de bikaranîn û girîngîya alfabeya **Celadet Bedirxan** anîye ziman. Di nivîsa xwe de behsa berdewamkirina gengeşîya li ser adaptekirina " **alfabeya Hawarê** " dike. Ji ber ku pêşketin û nûjenî di qadên enformasyon, ragihandin û teknolojiyê de çê bûye, pêwistîya guherandina tîpên bi binçengel û kumik (ç, ê, î, ş, û ji ber ku di karanîna înternetê de pirsgirêkan derdixin) tîne ziman û dibêje ku otorîteyek akademîk û netewî ji aliyê berpirsiyar û pisporan hatibe naskirin ne be tu guherînek çê nabe. Di vî nivîsê de ji pirsgirêka çareserkirina " **ç, k, p, t** " **yê der Salih Akin balê dikişîne ser bikaranîna tîpên " ç, ê, î, ş, û " yê jî. Her wiha di encamê de bêhempayîya alfabeya Hawarê tîne ziman (AKIN, Salih, 2006).**

Belê, bêhempayî û girîngîya alfabe-ya Hawarê re tu gotin tune ye. Lê em îro mêze dikin ku hinek kêmasîyên dengnîşankirinê he ne. Pirsgirêka tîpên bi kumik û çengel ne bi tenê zimanê Kurdî de, di her zimanî de he ye di bikaranîna enter-
netê de hemû tîp bê kumik û çengel tèn nivîsandin.

Gengeşiyek dine ji bo bikaranîna " i û

î " yê heye. Hinek lekolinvanên zimanê me dibêjin dengên ku di Kurdî de bi " i û î " yê tèn dîyarkirin wek Tirkî de bi " ı û i " yê bihata dîyarkirin jî dibû. Di nivîsê de wek hêsanî dibînin (**ÇE-LIKER, Celadet, 1996**). Lê belê meriv wextê li alfabeyên hinek zimanan mêze dike tu pêwistîyek ji bo dîyarkirina deng-
gan tune ye. Wek nimûne tîpa " **c** " yê ji bo kîjan dengê di zimanê me û zimanê Tirkî de hatîye dîyar kirin? Di zimanê Fransîzî û Îngîlîzî de ji bo kîjan deng û deng-
gan hatîye dîyar kirin? Meriv dikare mînakên zêde bike. Tîpen " **ç, g, s, x...** " yê ziman bi ziman cuda tèn bikaranîn. Pirsgirêka me " **kîjan tîp ji bo kîjan dengê hatîye dîyarkirinê** " nîn e. Pirsgirêka me, " îro di alfabeya me de tunebûna 4 deng-
gan " e û nedîtina çareserîya van deng-
gan e.

Avdo Karataş di gotara xwe ya bi navê " **Çareserkirina Pirsgirêka Alfabeya Latînî ji bo Kurdî** " de li ser dengên Kurdî yên ku bê tîp mane sekinîye û her wiha bi mînakên şîrove kirîye û dibêje " Ev mînak didin xwiyakirin ku ew tîpê latînî yên ku Celadet Bedirxan ji bo dengên Kurdî pêjirandî bi sêdî sed nê ehîl in. Lê di vir de **pirsgirêk ne pirsgirêka Bedirxan e, pirsgirêk ew e ku heta niha ti kesî, ku ji berhemên Bedirxan biburê, derneke-tiye.** Kurdî zimanekî indo-ewropeyî ye û ne samî ye. Xuya dike ku Kurmanciya jêr gelekî bin bandora erebî de maye û hinek karakterê kurdî wunda kiriye ". Bi taybetî **Avdo Karataş**, ji ber ku çareserîya kêmasî-ya deng-
gan nedîtine, **newêrekîya** kesên ku têkilîyên wan bi ziman re heye tîne ziman. Encama gotara xwe de ji perwerdehiyê pêwistîya **alfabeyek nû pêşniyarê** me dike (**Toplum ve Kuram, Sayı 5, Bahar-Yaz 2011**).

Zeynelabîdîn Zinar jî di nivîsa xweya bi navê " **Neh Dengên Kurdî ku di Alfa-**

beyê de Nînin " de wek gellek têkildarên zimanê Kurdî kêmasîya neh dengên (**a, h, l, o, p, r, s, t, z**) ku di alfabê de nehatîye dîyarkirin tîne ziman û dibêje " Ji van neh tîpên li jorê re çendî ku niha nîşan/işaret bo wan neyêne bikaranîn jî, lê belê di pêşerojê de divê ku çareserî ji bo wan bête

dîtin. " (**ZÎNAR, Zeynelabidin, 2013**). Wer tê xûyakirin haya her kesî ji vî pîrsgirêkê heye û gelek zanyar û têkildarên zimanê me vî pîrsgirêka dîyarkirin û nîşankirina hinek dengên Kurdî qebûl dikin, lê belê tu kesekî de **wêrekîya** dîyarkirina rêya çareserîyê tune ye.